
# Albuma Aram a nû derket

Berhemên nû yên hostayê mezin Aram Tîgran ên herî dawî li ser dixebitî ji Kom Muzîkê bi navê, "Xelatek ji bo hezkiriyên Tîgran ên li erdnigariya Rojhilata Navîn" derket. Di albumê de 16 berhemên Aram Tîgran li studyoyê li ser xebitî û heta niha nehatine weşandin, di albumê de cih digirin. Berhemên herî dawî yên Aram Tigran diyarî hunera gelê kurd û hezkiriyên xwe kiriye, klasîkên pêşerojê ne. Di albuma Aram Tigran a herî dawî ya bi navê "Gelê Kurd Dest Bidin Destê Hev" de stranek jî bi ermenkî cih digire... *RÛPEL - 9*




# Şanoya 'Zimanê Çiya' dê li Amedê bê pêşkêşkirin


**Şanogerê kanadayî li Amedê dê 'zimanê çiya' bilîze**

### DÊ ŞANOYA 'ZIMANÊ ÇIYA' BILÎZIN

Şanogerê kanadayî Luciano Iogna li Amedê ji bo şanogerên Şanoya Şaredariya Bajarê Mezin atolyeya şanoyê li dar xistiye û dixwaze di encama atolyeyê de lîstika Harold Pinter ya bi navê 'Zimanê Çiya' derxin ser dikê.

### ŞANOYÊ JI BO CIVAKÊ BI KAR BÎNIN

Iogna diyar kir ku ji ber bi şanogerên kurd re dixebite kêfxweş e û got der barê şanoya kurdî de agahiyên wî zêde nîn in û kurd dikarin pirsgirêkên xwe bi riya şanoyê bi hemû civakê re parve bikin û şanoyê wekî amûrekî bi kar bînin... *RÛPEL - 9*




ROJEV

20 Mijdar - În 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 8

## 'Bi makeqanûnê biparêzin'

Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna, nêzîkatiya hikûmetê ya li hemberî kurdî rexne kir û wiha got: "Dibêjin dê kursan vekin. Ev yek înkara gelê kurd e. Em dixwazin ku zimanê kurdî di makeqanûnê de bê parastin û bibe zimanê perwerdehiyê." *R.4*




## Roja xwe di girtîgehê de pîroz dikin

20'ê mijdarê di sala 1989'an de wekî Roja Mafên Zarokan a Cîhanê ji aliyê YE'yê ve hatiye qebûlkirin. Li Tirkiyeyê, di roja zarokan de 2 hezar û 814 zarok li girtîgehê roja xwe derbas dikin.

NÛÇE R3



## Malbatan serî li ÎHD'ê da

Tabloya şerê qirêj a dewletê her roj bi awayekî derdikeve holê. Piştî li Darayeniya Çewlikê di goreke tomerî de 38 hestiyên gerîlayên PKK'ê hatin dîtin, 120 malbatan serî li ÎHD'a Amedê da...

NÛÇE R3



## Malbata Taniş serî li dozgeriyê da

Piştî şahidên bûyera windahiyên Silopiyê axivîn û diyar kirin cenazeyê Serdar Taniş li Kerboranê, yê Ebubekîr Denîz jî li nêzî gundê Çelîkê hatiye definkirin, malbatên Taniş û Denîz hatin Kerboranê...

NÛÇE R3

# Tecrîda Îmraliyê girantir kirin

Dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê li ser navê şert û mercên başkirina Îmraliyê tecrîda heyî girantir kir. Parêzerê Ocalan Cengîz Çîçek got ku rewşa Ocalan ji berê nebaştir bûye



### 'REWŞA OCALAN XIRABTIR KIRIN'

Parêzerê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Cengîz Çîçek diyar kir ku li Girava Îmraliyê tecrîd nehatiye rakirin û girtiyên nû hatine jî tevlî tecrîdê kirine. Çîçek, derbirî ku Ocalan ragihandiye odeya wî ya nû bi qasî nîvê odeya wî ya berê ye û pirsgirêka bêhn dayîn û standinê zêde bûye.

### 'JI VÊ REWŞÊ FIKARÊN ME HENE'

Birayê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Mehmet Ocalan jî, daxuyand ku hevdîtina vê hefteyê ya herî zor a 10 salan bûye û cihê Ocalan ji berê xirabtir bûye. Mehmet Ocalan diyar kir ku şert û mercên birayê wî girantir bûne û ji vê rewşê fikarên wan hene... *RÛPEL - 5*

### SAL BI SAL XWEZÎ BI PAR

Hesasiyeta gelê kurd a der barê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de tê zanîn. Hate ragihandin cihê Rêzdar Ocalan hatiye guhertin, girtiyên nû birine Îmraliyê lê belê di rastiyê de ji rewşa berê xirabtir pêkanînek dane destpêkirin. Wisa xuya dike sîstemê bi rêbazên cuda didomînin... *A. OGUR R.2*

## Zîndanî 6 mîtroqare

Nimûneya peynî a nêrayêrteyî-vûrgûnî, zîndana ke Îmralî de ameyo viraştiş de vejya. Vejya orte ke, zîndana ke ameyo viraştene her odeyê ey 6 mîtroqare yo. 10 xaneyî wina û teşkîlat û vagirotiş heme wa 100 mîtroqara ca bigo... *E. BIRA R.8*

## MURAT KARAYILAN:



# Bêyî PKK'ê çareserî nabe

Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan got ku Hikûmeta AKP'ê mecbûr e PKK'ê esas bigire û wiha got: "Li holê çareseriyek nîn e. Polîtîkayeke ji bo xapandina kurdan heye. Hikûmeta AKP'ê li gorî cidiyeta vê pirsgirêka giran nêz nabe. Bêyî PKK'ê ne mimkûn e ku tu pirsgirêk bêne çareserkirin. Hûn mecbûr in ku PKK'ê esas bigirin. Ne wisa be hûn ê nikaribin tiştekî bikin."... *RÛPEL - 5*

## Ji bo îfadedayînê bangî koma aştiyê kirin

Serdozgerê Komara Amedê ji bo lêpirsîna Komên Çareseriya Demokratîk yên ji Qendîl û Mexmûrê hatin û bi awayekî girseyî hatin pêşwazîkirin, ji bo îfadedayînê bangî endamên Koma Aştiyê yên ji Qendîlê hatin kir. Di çarçoveya lêpirsîna ku dozger dimeşîne de, heke hewcedarî bê dîtin, dê der barê koma ji Qendîlê hatiye de ji ber "propagandaya rêxistinê" û "pesndayîna sûc û sûcdar" doz bê vekirin.

## Perwerdeyî û polîtîkaya helnayişê



Giraneya perwerdeyî ser o zaf çiyî vajîyayî. Heme kes zî zano ke, heme merdiman rê yew perwedeyî hewce kena. Feqet çi bêj yew perwerdeyî? Çi heyf ke, goreyê hewceyîya şaranî Tirkîya, yew perwerdeyîya demokratîk...

MAMOSTE SILÊMAN R 8

## Helbesta şairê afrîkî 'min ji bîr meke'



Dema ku min helbesta şairê afrîkayî xwend, bêhemdî xwe ez vegeriyam sala 2003'yan; kêlîkên daxuyandina Herêma Kurdisatanê di nava sînorên Iraqê de. Wan rojan bi bihîstina daxuyandinên wê demê re...

ARJEN ARÎ R 11

www.sivakurdi.org



Azîz Ogur
abdulazizogur@hotmail.com

## Sal bi sal xwezî bi par

Pêşveçûn, guhertin, veguhertin û nûbûn qanûneke xwezayê ye. Gotineke populer a têkildarî vê yekê di salên borî de pir dihate bikaranîn: "Tiştê bi tenê nayê guhertin, guhertin bi xwe ye." Hêz an sîstemên li hember vê yekê rawestin heta demekê dikarin temenê xwe dirêj bikin lê belê di dawiya dawî de çarenûsek li benda wa ye. An guhertin an jî têk çûn.

Di vê mijarê de tevgera hêzan a li hember guhertinê û xwe guhertin yekser bi asta zanistiya wan ve girêdayî ye. Hêzên xwedî zanist û modern xwe li gorî demê amade dikin heta bi pêşbîniyeke xurt bingehê guhertinê amade dikin û beyî qolinc, qeryanên mezin werin kişandin pêvajoyên giran ên guhertinê derbas dikin.

Hin hêz jî hene ku di statukoyên berê de israr dikin û li hember pêşveçûn û meyldariya mirovahiyê ya di warê zanistî, teknolojî û demokrasiyê de bi hemû hişkiya xwe radiwestin. Ev hêz jî di dawiya dawî de mahkûmî têkçûnê ne û bi destên hêzên derve an dînamîkên hundir bi teqîn, bûyerên mezin serobino dibin, têk diçin ji holê radibin.

Hin hêz jî hene di navbera statuko û nûbûnê de fetîsî ne. Di gotinê de dixwazin xwe mîna pêşketî an meyldariyên pêşketinê nîşan bidin, lê di cewher de tengbûn û statukoparêziyeke stûr heye. Lingekî wan li cîhana pêşketî ye, yek li kevneperestiya sedema navîn e. Qaşo gav û guhertinên bi navê pêşketinê tên avêtin jî tenê û tenê ji bo xapandin û berterafkirina ceza, rexne an zextên navneteweyî û hundirîn e.

Ji bo hêzên behsa wan hate kirin mînaka herî guncav rewşa dewleta tirk, hikûmetên heta niha hatine ser desthilatdariyê û hikûmeta AKP'ê ya niha desthilatdar e. Ev hêz hemû nirxên gerdûnî û destkeftiyên mirovahiyê yên pîroz ji cewher dixin û ji bo bicihkirina rastiya xwe ya kevneperest mîna maske bikar tînin. Lewma guhertinên qanûnî û destûrî bi giştî li ser kaxizê dimîne û di pratîkê de tiştekî tê guhertin tune ye. Hemû guhertinên di çarçoveya ahenga bi Yekîtiya Ewropayê re, an qaşo guhertinên li ser zextên saziyên navneteweyî tenê di gotinê de dimînin, yanî tenê li ser kaxiz û belgeyên di bin flaşên çapemeniyê de bi merasîman hatine îmzekirin dimînin. Di pirsgirêka kurd de hemû gavên hatine avêtin bi heman rengî ne. Li ser belgeyan kurdî serbest e lê siyasetmedar rojane ji ber axaftinên kurdî tên ceza kirin. OHAL hatiye rakirin lê ji Wan heta Colemêrgê 16 caran lêgerîn pêk tên. Bi sedan, bi hezaran mînak dikarin werin rêz kirin.

### Başkirinên qaşo yên li Îmralî

Mînaka herî dawî ya xeter jî rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Hesasiyeta gelê kurd a der barê mijarê de tê zanîn. Li dijî tecrîdê rojiya mirinê jî di nav de kurdan bi hemû rê û rêbazan hêrsa xwe nîşan de. Her wiha ji ber hewldanên gelê kurd saziyên navneteweyî yên mîna Komîsyona Astengkirina Îşkenceyê (CPT) ya girêdayî Konseya Ewropayê ketin nava tevgerê û zext li Tirkiyeyê kirin. Dewleta tirk niha bi feneke mîna yê beriya niha qaşo di rewşa Rêzdar Ocalan de başbûnan pêk tîne nîşan dide. Lê belê diyar e tiştê tê kirin gotina pêşiyên kurdan a 'Sal bi sal xwezî bi par' piştrast dike. Hate ragihandin cihê Rêzdar Ocalan hatiye guhertin, girtiyên nû birine Îmraliyê lê belê di rastiyê de ji rewşa berê xirabtir pêkanînek dane destpêkirin. Ocalan der barê vê yekê de pêr di hevdîtina bi parêzerên xwe re de got, "Sîstema hewayî xerab e, pencere xirab in. Gotin başkirin lê cihê min yê berê baştir bû. Navê vê yekê ne başkirin e".

Parêzeran jî ragihand ku odeya nû ya Ocalan nîvê odeya beriya niha ye. Her wiha cihê hevdîtina bi parêzer û malbatê re jî hatiye guhertin û li dewsa odeyê hevdîtin di kabîneyeke camî de pêk tê. Li aliyê din êdî rayedarên girtîgehê piştî her hevdîtinê der barê Ocalan de lêpirsîneke nû didin destpêkirin.

iyar e dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê ji bo berterafkirina rexneyên heyî di bin navê 'guhertin' û 'başkirinan' de sîstema Îmralî didomînin û tecrîda li ser Rêzdar Ocalan bi rê û rêbazên cuda tundtir dikin. Her wiha tenduristî û ewlekariya wî ji berê bêtir dixin xetereyê.

Dibe ku dewleta tirk bi van kirinên xwe yên tenê li ser kaxizê raya giştî ya navneteweyî û saziyên pêwendîdar yên Ewropayê bixapîne lê belê gelê kurd rastiya vê dewletê baş dizane. Li hember vê xapandin û hîlekariya ku rewşa Rêberê Gelê Kurd ji berê xirabtir kirine diyar e tevgera azadiya Kurdistanê û gelê kurd bêdeng nemîne. Di rojên pêş de ev mijar dê bibe rojeveke bingehîn a gelê kurd û mîna xapandinên beriya niha wê di vê mijarê de jî maskeya dewleta tirk û AKP'ê bînin xwarê.

# Nameya dawiyê ya Îhsan Fetahiyan*

**Li gorî zordar û desthilatdaran, mirina min yê bibe sedema ji holêrabûna pirsgirêkekê ya bi navê "pirsgirêka Kurdistan"ê, divê bêjim ku ev xeyal û ramaneke pûç û vala ye**




Tîrêjên rojê yên dawiyê di çaxê êvarê de, riyekê didin xuyanîkirin ku ez daxwazkarê nivîsîna wê me. Xişexişa pelên dara di bin pêngavên min de dibêjin: Bihêle heya ku bikevî, hingî tu yê riya azadiyê peyda bikî.

Qet ji mirinê netirsiyame, heta vê gavê ku di etmosfêrê herî nêz û çaxê herî samîmî de, li kêleka xwe his dikim. Mirinê bêhn dikim û carake din dinasim, çimkî ew nasekî dêrîne ji vî gel û welatî re. Ne bi mirinê re belkî li ser sedemên mirinê dipeyivim, niha ku "tawan"(1) hatiye guherandin û ew weke maf û azadî wergerandine, gelo mirov dikare ji aqûbet û encama xwe ya dawiyê bitirse? "Em" yên ku ji aliyê "wan" ve bi mirinê hatine mehkûmkirin, di têkoşîn û li pey peydakirina kune ronahiyekê bûn ku jiyana me ber bi cîhaneke baştir û dûr ji hemû mafkûjiyê ve bibe, gelo ew jî haydarî kar û kirinên xwe ne?

Min li bajarê Kirmaşanê dest bi jiyanê kir, cihê ku mezinahiya wê tim li ser zimanê welatiyên min e, cihê ku dergûşa bajarvaniya welatê min bûye. Kûrahiya hişê min ez ber bi wê rastiyê ve kişandim ku cudatî û rewşeke ne rewa li wira bibînim û ji hemû kûrahiya canê xwe cewherê wê fêm bikim ku behsa zilmê dikir, stem û zilma der heqê mafê min de wek takekes û der heqa min de weke komeke insanî (civakî). Peyketina çima ya vê zilmê û rakirina wê, hezaran rê û raman nîşanî min dan, lê mixabin ku wan rê li ber etmosfereke wiha girtibûn û mafxwazî jî cemidandibûn û tepisandibûn ku di hundir de min riyek peyda nekir û tevî hemû sînorên destçêkirî min ber bi cihekî din û hêlîneke din ve bar kir: "Ez bûm Pêşmergeyê Komelê."

Evîn û heza ji bo peydakirina kesayetiya xwe û nasnameya ku ez jê hatime bêpar kirin, ez ber bi wira ve kişandim. Dûrketina ji cihê ji dayikbûnê tevî ku ezabê dide mirova û zehmet jî bû, lê ew tu carî nebûn sedema qutbûna min ji cihê ji dayikbûna min. Her çend carinan bi armanca dubare hevdîtin û peydakirina bîranînan, ber bi mala xwe ya yekê ve diçûm, lê carekê "wan" tam û xweşiya hevdîtinê di qirika min de tehl kirin, ez girtim û avêtim nava qefesê. Hema ji destpêkê û bi wê mêvanperweriya mirovhezane ya kesên ku ez girtibûm! Min zanî ku hemen qedera trajîk û xemgîn a koçer û rêgirên vê riya tejî kerwan li benda min e: Îşkence, dusya duristkirin, dadgehên alîgir (2) û bi awayekî dijwar kontrolkirî, biryarek tam neadilane û siyasî û di dawiya dawî de mirin…

Rawestin ez hinekî samîmetir ji we re bêjim: Piştî girtinê li bajarê Kamyaran di 29'ê nîsana 1987'an da û piştî çend saet mêvanbûna di îdareya Îtlaata wî bajarî de, di rewşekê de ku kelepçe û çavbendeke stor bizav û dîtin ji min re yasax kiribûn, kesekî ku xwe wek berdevkê dadyar bi min da nasandin, dest bi pirsîna hinek pirsên bêwate û tejî tawanên ku tu peywendî bi min ve nebûn, kir. (Pêwîst e bê gotin ku her cure lêpirsîneke qezayî di cihekî ji xeynî dadsera û dadgehê de li gorî zagonê yasax e).

Bi vî awayî kilîl li dewra yekê ya lêpirsînên min yên takane xistin (3). Di hemen şevê de ez birim îdareya îstixbarata bajarê Senendecê û xweşî an jî şahiya rastîn li wira bi min dane tecrube kirin: Hucreyek pîs bi tuwalêteke bêhnnexweş û betaniyên ku xuyabû çend deh salek ji hevdîtina wan a bi av û paqijiyê re derbas bibûn. Ji wir û şûn de bi şev û roj dalana li jêr erdê û odeyên lêpirsînê bi tama lêdan û îşkenceyên pir giran û li derveyî hêza berxwedana mirova bûn karekî bêdawî û li pey hev ku sê mehan berdewam bû. Kesên birêz yên ku lêpisrîn bi min re dikirin bi armanca bilindkirina cih û rutbeya karê xwe û di xeyala bidestxistina çend qûroşên kêm û bêqîmet, di van sê mehan de dest bi çêkirina tawan û sûcên ecêb û xerîb kirin ku wan bixwe jî bêtir ji her kesî bi duristnebûna wan îman û bawerî hebûn. "Bi îmtihankirina hemû şêweyan û ez di kiryara çekdarî de beşdar bûbûm" ew sûc bûn yên ku di îspatkirina wan de pir xebitîn. Tenê xala ku hate îspatkirin endambûna min ya di Komelê de û propagande li dijî sîstemê bûn ku baştirîn belge ji bo sûcdarkirin û dayîna hukimê dadgeha yekê bûn. Şûbeya yekê ya dadgeha înqilaba îslamî li Senendecê, cezayê deh salan bi sirgûna bo girtîgeha Ramhûrmoz da.

Sentêza îdarî û siyasî li Îranê her tim bi nexweşiya navendgerayî (4) re rû bi rû bûye, lê vê carê tevî ku li ser bûyerê xeberdar jî bûn di zahir de dixwestin girêdana bi biryarên navendê re hilînin. Di van çaxên nû de insiyatîf û selahiyeta dubare lênêrîna hukimê cezayê ji tawanbarên siyasî re di dereceya herî bilind de- heta îdam- ji dîwana bilind standine û spartine mehkemên dubare lênêrîna wilayetê. Bi îtiraza dadyarê bajarê Kamyaran li ser hukimê yekê û cihê ecêbeke mezin e ku berevajî zagonên girêdayî babet û hundirî Îranê bixwe jî, şûbeya çarê ya dadgeha dubere lênêrîna wilayeta Kurdistanê, hukimê 10 sal zindanê kirin îdam!. Li ser esasê benda 258 a zagona dadweriya dayîna cezayê, mehkemên dubare lênêrînê tenê di rewşekê de dikarin li dijî hukimê yekê biryareke nû bidin ku cezayê hatî dayîn ji kêmtirîn hedê cezayên diyarkirî di qanûnê de, kêmtir be. Li gorî daxwaza dadwer sûcê ku ez pê hatime tawanbar kirin- yanî muharibe(dijiminî bi Xwedê re)- hukimê herî kêm di vê der barê da yek sal e, îcar niha hûn bixwe ferqa 10 salên bi sirgûnê bi vî hukimê herî kêm re bidin berhev (qiyas bikin) da ku bi bêqanûnî, bêhiqûqî û siyasîbûna hukimê îdamê bizanîbin û jê fêm bikin. Elbete gerek bê gotin û neyê jibîrkirin ku: demeke kin beriya guherîna hukimê yekê, careke din ez ji girtîgeha navendiya Senendecê birin girtîxana îstixbaratê û li wir ji min hate xwestin ku di hevpeyvîneke vîdeoyî de li ser hinek karên ku min nekirine îtiraf û peyv û cumleyan di redkirina fikir û ramanên xwe de beyan bikim. Bi hemû zextên pir giran re, ez amade nebûm ku daxwaza wan a nemeşrû bipejirînim û wan jî bi aşkerahî gotin ceza min ê bikene îdam ku gelek zû soza xwe anîn cih û girêdana dadgehê ya bi berpirsên emniyet û yên ku ji qezawetê fêm nakin, îspat kirin. Îcar ger waye gelo mirov dikare rexneyekê li wan bigire?!

Qazî sond xwariye ku li her derê, her çaxekî û li hemberî her takekes û babetekî de bêalî dimîne û tenê ji pencereya hiqûq û qanûnê yê li cîhanê binêre. Îcar dema ku sedaqeta qazîyê vî welatî ketiye ser riyeke şaş, gelo ew dikare îdia bike ku sonda xwe neşikandiye û bêalî û adil maye? Li gorî min hejmara qaziyên wiha nagihê hejmara tiliyên destekî. Dema ku hemû sîstema qezayî ya Îranê tenê bi îşare û destûra lêpirsekî (5) nezan û cahil di warê xwîndina hiqûqî de fermana girtin, mehkeme, zindanîkirin û mirina kesan îcra dike, gelo mirov dikare li ser yek an jî çend qazî yên bêdesthilat û biçûk yên wilayeteke her tim li jêr zilmê û siyaseta apartheid de mayî, gilî-gazinan bike? Belê mal ji esas û bingeha xwe da wêran e…

Niha tevî ku di hevdîtina dawiyê di zindanê de bi dadwerê ku berê ceza yekê daye, li ser neqanûnîbûna îcrakirina hukimê niha israr dike, lê ji bo cara duyem jî ew dixwazin hukimê îdamê pêk bînin. Pêwîst e bê gotin ku israreke wiha ji bo cih bi cihkirina destûrê bi her awayekî ku mumkûn e, encama zexta saziyên emniyetî û siyasî yên li derveyî "quveya qezayîyê"ye (6). Kesên endam di van saziyan de tenê bi riya fîşên hiqûqî, kîn û armancên xwe yên siyasî li mesela mirin û jiyana girtiyekî siyasî dinêrin. Ji wan re ji xeynî armancên nemeşrû tu "pirsgirêk"ek nayê ber çavan û beyankirin. Heta ger ew tişt yekemîn mafê ku bi mirov re tê dinê yanî mafê jiyanê jî be. Belgeyên cîhanî û navneteweyî ji wan re pêşkêş bin, lê ew heta zagon û disîplînên nava xwe jî hîç û vala dihesibînin.

Lê gotina dawiyê: Ger li gorî gumana zordar û desthilatdaran, mirina min yê bibe sedema ji holêrabûna pirsgirêkekê ya binavê "pirsgirêka Kurdistan"ê, divê bêjim ku ev xeyal û ramaneke pûç û vala ye. Ne mirina min û ne jî mirina hezaran kesên weke min nabe melhemek ji dermankirina derdekî wiha bêderman re û çiqas jî yê agirê wê gurtir û geştir bike. Bêguman: "her mirinek jiyaneke din bixwe re diafirîne." (7)

***Îhsan Fetahiyan***
***Girtîgeha Navendiya Senendec***
***17. 08. 1388***

***TÊBÎNÎ:***

** Name yekşemê di 17'ê meha Abana sala 1388'ê Şemsî de hatiye nivîsandin (08. 11. 2009). Sê roj piştî nivîsandina vê nameyê Îhsan Fetahiyan di temenê 28 saliyê de hate îdamkirin. Nameya Îhsan Fetahiyan bi giştî mîna orjînala wê wergera wê ji farisî hatiye kirin.*

*1. "tawan" hatiye guherandin: Li vir Îhsan behsa sûcê xwe yê berê dike ku 10 sal zindan bûn, lê niha tawana wî mezintir kirine û bûye îdam.*

*2. Dadgehên alîgirên sîstema serdest li Îranê ku mafê welatiyan dikine fidayê biryarên siyasî û dûr ji edaletê.*

*3. Yanî lêpirsînên min yên yekê û destpêkê, dan destpêkirin.*

*4. Navendgerayî: Yanî peywendî û girêdana ji sedî sed bi biryar û qirarên kesên ku li Tehranê dikarin biryara herî dawiyê bidin.*

*5. Lêpirs ew kese yê ku dema girtinê dibe berpirsê girtiyekî siyasî û dosya wî ya ji bo mehkemê amade dike. Fars ji kesên wiha re dibêjin: "bazco" yanî kesê ku bi îşkence û darê zorê kesan neçar dike ku biaxivin.*

*6. Saziya ku karê qezawetê li hemû Îranê dike.*

*7. Di sîstema totalîtera komara îslamî de tenê gotineke wiha bes e ku bi hezaran kesên weke nemir Îhsan Fetahiyan îdam û gulebaran bike. Hemû felsefe û evîna pîroza qehremanekî weke Îhsan Fetahiyan di vê gotina wî de ji me re aşkera dibe. Bi vê re elbete rayedarên "komara wehşetê" yê kesên wiha ku dikarin serkêşiya doza gelê xwe bikin, bikujin. Îhsan Fetahiyan bû sembola berxwedana gelê kurd li rojhilatê Kurdistanê. Ew Qazî Mihemedê vê sedsalê ye.*

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL
Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91 Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
Yaygın Süreli Yayındır

# Xizmên Taniş û Denîz li Kerboranê ne

Xizmên Serdar Taniş û Ebubekîr Denîz ên HADEP'î ku ji aliyê dewletê ve di 2001'ê de hatibûn binçavkirin û piştre hatibûn qetilkirin, hatin navçeya Kerboranê.

Piştî şahidên bûyera windahiyên Silopiyê axivîn û diyar kirin cenazeyê Serdar Taniş li Kerboranê yê Ebubekîr Denîz jî li nêzî gundê Çelîkê hatiye definkirin û ev nûçe di çapemeniyê de derket, malbatên Taniş û Denîz hatin Kerboranê. Malbat ji bo gor bên vekirin dê serî li Dozgeriya Kerboranê bidin.




Serokê HADEP'a Silopiyê Serdar Taniş û rêveberê navçeyê Ebubekîr Denîz di 2001'ê de ji bo îfadedayînê ji aliyê qereqola Cendirmeyan a Silopiyê ve têne gazîkirin. Piştî ku diçin qereqolê careke din ji wan agahî nayê girtin. Li ser windakirina Taniş û Denîz ku wekî "Windahiyên Silopiyê" tên zanîn 8 sal derbas bû. Der barê bûyerê de ewil leşkerekî ku bûye şahidê bûyerê axivî û piştre jî şahidên din ên li Kerboranê axivîn. Ev nûçe di çapemeniyê de hatin weşandin. Li ser vê yekê malbatên Taniş û Denîz serî li Dozgeriya Silopiyê dan. Ji dozgeriyê talîmata ku gor bên vekirin girtin û li ser vê yekê malbat hatin Kerboranê. Malbata Taniş ji bo vekirina gorê dê serî li Serdozgeriya Komarê ya Kerboranê bide. **MÊRDÎN**

# 120 malbatan serî li ÎHD'ê da

**Piştî li navçeya Darayeni di goreke tomerî de 38 hestiyên gerîlayên PKK'ê hatin dîtin, malbatên PKK'iyan ketin nava hewldanan û 120 malbatî serî li ÎHD'a Amedê dan**

Tabloya şer a ku dewleta tirk li hemberî gelê kurd didomîne her roj bi awayekî derdikeve holê. Li aliyekî cenazeyên kesên ku ji aliyê leşker û polîsan ve hatine girtin û piştre hatine qetilkirin, li aliyê din jî gorên tomerî yên gerîlayên di pevçûnan de hatine qetilkirin derdikevin holê. Meha borî li rex goristana taxa Kultur a navçeya Darayeni ya Çewlikê, li herêma leşkerî di goreke tomarî de hestiyê aydî 38 gerîlayên PKK'ê hate dîtin.

Piştî hestî hatin dîtin, malbatên ku zarokên wan di nava PKK'ê de ne bi şika hestiyê zarokên wan jî di nav de bin serî li Şaxên ÎHD'ê dan. Di navbera salên 1988 û 1997'an de li Çewlikê gelek endamên PKK'ê di operasyon û kemînan de bi komî jiyana xwe ji dest dan û bi komî hatin definkirin. Piştî hestiyên endamên PKK'ê di gora tomarî de hatin dîtin, li Amed, Stenbol, Îzmîr, Edene, Mêrsîn û Êlihê 120 malbatan bi boneya bigîjin hestiyên zarokên xwe serî li Şaxên ÎHD'ê dan. Têkildarî serlêdanên malbatan Sekreterê ÎHD'a Amedê Burhan Zorooglu, diyar kir ku ji bo hestiyên 38 endamên PKK'ê heta niha 120 malbatî serî li komeleyê daye û 85 malbatan jî mînaka xwîna xwe daye dozgeriyê. Zorooglu, anî ziman ku 35 malbatan jî ji bo mînakên xwîna xwe bidin, serî li dozgeriyê dane. Zorooglu, destnîşan kir ku ji kesên li derveyî welat jî yên serî li komeleyê dane, hene.



Burhan Zorooglu

**Hestiyên 38 PKK'iyan...**

Zoroolu, bang li malbatên ku zarokên wan di navbera salên 1988 û 1997'an de li herêma Çewlikê jiyana xwe ji dest dane kir û xwest serî li komeleyê bidin û piştgiriya hiqûqî bixwazin. Zorooglu, bal kişand serlêdana malbatan û wiha got: "Di serlêdanan de ne tenê malbatên ku zarokên wan di navbera salên 1988 û 1997'an de jiyana xwe ji dest dane, hemû malbatên ku zarokên wan jiyana xwe ji dest dane û gorên wan ne diyar in dikazin serî li komeleyê bidin. Lê em tenê serlêdanên ji bo herêma Çewlikê qebûl dikin." Zorooglu, anî ziman ku tenê daxwaza malbatan dîtina hestiyên zarokên wan e. Piştî hewldana ÎHD'a Amedê di 11'ê cotmehê de li navçeya Darahênê kolandina goran pêk hat. Di encama kolandinan de gora 18 kesên di navbera salên 1990 û 94'an de jiyana xwe ji dest dabûn, 4 kesên piştî sala 1994'an jiyana xwe ji dest dabûn û gora 16 kesên piştî sala 1997'an jiyana xwe ji dest dabûn hate dîtin. **AMED (DÎHA)**

# Ji ber axaftina bi kurdî ceza dan wan

Zext û zordariyên li ser kurdî roj bi roj zêde dibin. Her çiqas hikûmeta AKP'ê dibêje tu zordarî li ser kurdî tûneye jî, lê dadgeh her roj ji ber axaftinên kurdî cezayan dide welatiyan. Namzetê Şaredarê DTP'ê yê Bajaroka Karabaglarê ya Îzmirê Cemal Coşkun û Namzetê Navçeya Gazîemîrê yê Îzmîrê Şehmuz Seyhan ji ber ku berî hilbijartênên 29'ê Adarê di çalakiyekê de kurdî axivîbûn 6 meh cezayê girtîgehê li wan hate birîn.

6'emîn Dadgeha Cezayên Sulhê ya Îzmîrê ji ber ku di hilbirjartênên 29'ê Adarê de bi henceta kurdî propoganda kirine ji namzetên Partiya Civakî ya Demokratîk (DTP) yên Bajaroka Karabaglarê ya Îzmirê Cemal Coşkun û Namzetê Navçeya Gazîemîrê yê Îzmîrê Şehmuz Seyhan re 6 meh ceza birî. Dadgehê, di danişîna biryarê ya di 3'yê mijdarê de li gorî hejmar 298'an a têkîldarî hilbijartinan de û bi riya madeya 58'an û li gorî madeya 151/2 ji bo her yekî 6 meh cezayê girtigehê birî. Cezayê girtîgehê vegêrandine 3 hezar pere. Cemal Coşkun, diyar kir ku biryara dadagehê dayî dê temyîz bikin û wiha got: "Gavên hikûmetê yên çareseriyê tenê xapandinin û tu tiştî nînin. Serokwezîr û wezîr bi kurdî di axivin û TRT Şeş kurdî weşanê dike tu cezayan nagirin. Lê dema ku kurd bi kurdî bi axivin rastî cezayan tên." Coşkun anî ziman ku hewçehiyek bi makezagoneke sivîl û demokrastîk heye û wiha domand: "Divê makezagonekî demokratîk bê çêkirin. Li Agiriyê dadgeh ji ber propogandeya kurdî beraatan didin, lê di vê dozê de ceza hate dayîn. Ev yek jî nişan dide ku dadgeh biryarên nakokî didin û biryar siyasi ne."

Li gorî madeya 58'an û hejmara zagona 298'an "Qedexeyên têkîldarî weşanên propogandeyan" û "Li ser belavok û tiştşên din ala tirkan, îbareyên olî bên bikar anîn qedexene. Di radyo û televizyonan de û propogandeyên din bilî zimanê tirkî zimanên din û nivîsandinên din qedexene" cih digire.

Li gorî madeya 151/2'an jî "Berî roja deng danê saet 18.00'an şunda kesên propogandayê bikin, civînan pêk bînin dê 3 meh û 6 meh cezayê girtîgehê û 15 hezar û 75 hezar cezayên giran yên pere dê lê bê birin." **ÎZMÎR**

# Navê Ceylan Onkol dan parka zarokan

Şaredariya Wanê, parka zarokan vekir û navê Ceylan Onkol a 12 salî ku li navçeya Liceyê ya Amedê di êrîşa leşkerî de hatibû qetilkirin, lê kir.

Şeredariya Wanê, li taxa Suphanê, parka zarokan ku ji 5 hezar metrekareyî pêk tê vekir û navê Ceylan Onkol a 12 salî lêkir. Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, amîrên yekîneyên şaredariyê, endamên Meclîsa Şaredariyê û zarok jî di nav de komeke qerebalix beşdarî merasîma vekirinê bûn. Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, diyar kir ku taxa Suphanê di warê binesaziyê, çêkirina cihên şînkayî û parkên zarokan de, cihekî bêpar hatiye hiştin û da zanîn ku yekemcar e li taxê parkeke zarokan tê çêkirin. Kaya, desnîşan kir ku parq bi hevkariya welatiyan û şaredariyê çêkirine û wiha got: "Wekî şaredariyê me malzeme anîn. Lê di tevahiya xebatan de welatiyên li taxê, bi dildarî beşdarî xebatan bûn. Li vir care yekem e ku parkeke zarokan tê çêkirin. Li ser zeviya 5 hezar metre kareyî hatiye çêkirin. Li ser daxwaza welatiyên li vir me navê Ceylan Onkol da vir." Kaya, anî ziman ku li welatên hemdem ji bo kesekî 30 metre kare qada şênî dikeve, lê li Tirkiyeyê 5-6 metre kare ye. Li Wanê jî ev rêje 1,2 ye. Kaya, bi lêv kir ku ji niha û şûnde ji bo qadên şînkayiyê zêdetir bikin dê hewldanênxwe berfirehtir bikin. Piştî axaftina Kaya, park hate vekirin. **WAN**

# Roja zarokan e lê ew di girtîgehê de ne

Li Tirkiyeyê, 2 hezar û 814 zarok di '20'ê Mijdarê Roja Mafên Zarokên Cîhanê' de di girtîgehan de ne.

Li cîhanê '20'ê Mijdarê Roja Mafên Zarokên Cîhanê" di sala 1989'an de ji aliyê Welatên Yekbûyî (YE) ve hate qebûlkirin. Ev roj ji aliyê 193 welatan ve hate qebûlkirin. Li gorî vê rojê hemû zarokên cîhanê xwedî heman maf in. Divê hemû zarokên cîhanê li hemberî êrîş, binpêkirina mafan bên parastin û mafên zarokan ji aliyê hemû welatan ve bi zagonan bêne parastin. Ev roj her sal ji aliyê gelek welatên cîhanê ve tê pîrozkirin. Lê "Roja Mafên Zarokên Cîhanê" li Tirkiyeyê bi piranî zarokên kurd, li girtêhan û di binçavan de derbas dikin.

Tirkiye, ligel êrîş, binpêkirin û zextên li ser zarokan, bi girtin û cezayên li zarokan dibire jî di rêza welatên cîhanê de ye. Bi zagona hejmar 3713 a TMK'ê bi sedan zarok hatin girtin. Bi vê zagonê re zarokên hatin binçavkirin û girtin derûniya wan xira bû û nexweş ketin. Zarok 2 qatî temenê xwe rastî cezayan hatin û hîn jî têne darizandin.

Bangawazên Edaleta ji bo Zarokan, di rapora xwe ya meha hezîrana 2009'an de diyar kir ku li Tirkiyeyê 2 hezar û 814 zarok girtî ne. Di raporê de hate diyarkirin ku di sala 2006'an de ji ber TMK'ê hezar û 56 zarok li Dadgehên Cezayê Giran hatin darizandin û di encama darizandinan de 208 zarok rastî cezayan hatin. Dîsa li gorî raporê ji ber TMK'ê hezar û 56 zarokên temenên wan di navbera 12-18'an de li Dadgehên Cezayê Giran hatin darizandin. Dîsa di çarçoveya zagona TCK'ê ya hêjmar 301 de 16 zarok di dadgehan hatin darizandin.

Bi taybetî li herêma Çukurovayê ji sala 2008'an heta niha 193 zarok li dadgehan hatin darizandin. Li gorî Wezareta Dadê di 31'ê tebaxê de 2 hezar û 637 zarok li girtîgehan girtî ne. Hezar û 230 zarok bi daxwaza ceza, têne darizandin û ji van 243 zarok cezayên wan teqez bûne. Li gorî rapor û daneyan Tirkiye piştî Ukrayna û Îngilistanê di rêza 3'yemîn de, li gorî nifûsê piştî Îrlandayê di rêza 2'yemîn de cih digire. **ENQERE**




# 'Li Îmraliyê tecrîd ranebû hîn girantir bû'

**Dewleta tirk li Îmraliyê qaşo şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan baş kirin. Ji odeya ku tê de dihate hiştin neqilkirin odeyeke nîvqasî wê. Ocalan ragihand ku şertên wî xirabtir bûne**

Parêzên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, diyar kirin ku bi guhertina Girtîgeha Taybet a Yekkesî ya Îmraliyê ya Girtîgeha Tîpa F yê rewşa heyî hîn girantir bûye û li cihê tecrîdê rakin, girtî xistine nava tecrîdeke girantir. Parêzerên Ocalan, daxuyandin ku ev yek ne gavek başkirinê ye, girankirina tecrîd û îzolasyonê ye, divê raya giştî vê wiha bizanibe.

Parêzeran, guhertina Girtîgeha Taybet a Yekkesî ya ku ev 10 sal in Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan lê girtî tê hiştin ku vegerandin Girtîgeha Tîpa F û şandina 5 girtiyan nirxand. Parêzer Cengîz Çîçek ku ji bo hevdîtina hefteyî ya asayî a bi muwekîlê xwe Ocalan re çû girava Îmraliyê, destnîşan kir ku li girtîgehê tecrîd nehatiye rakirin û girtiyên nû hatine jî tevlî tecrîdê kirine. Çîçek, anî ziman ku Ocalan roja sêşemê birine girtîgeha nû, lê rewşa niha ji ya berê nebaştir bûye.


Mehmet Ocalan


Cengîz Çîçek

**'Tecrîd hîn girantir kirine'**

Parêzer Çîçek, bi lêv kir ku ev yek wekî rewşeke başkirinê nîşanî Ocalan kirine lê ragihand ku lazim e raya giştî bizanibe ev yek başkirina rewşê nîn e, zêdetir girantirkirina tecrîdê û îzolasyonê ye. Çîçek, derbirî ku Ocalan ragihandiye odeya wî ya nû qasî nêviyê odeya wî ya berê ye û tenê 6 metre kare ye û wiha got: "Muwekîlê me diyar kir ku ji dema cihê wî hatiye guherandin, pirsgirêka bêhn dayîn û stendinê zêde bûye û heta qirika xwe bêhnê nastîne. Muvekîlê me anî zima ku ji bo ew karibe bêhnê bi rehetî bistîne divê nêzî şibakêbe û ji ber şibake nebaş e bi zahmetî bêhnê dide û distîne. Muekilême got roj raste rast li ruyê wî dixe û zahmetiyê dikşîne." Çîçek, da zanîn ku derdora qabîna hevdîtinê bi camên zelal bi aweyekî derve bibîne hatiye dorpêçkirin û lêbûrbûna wî asteng dike. Çîçek li ser rewşa muvekîlê xwe wiha got: "Odeya muvekîlê me ya berê ji bo hevdîtinê başdir bû. Ya niha bêtir em dûrî hevin. Ji bo muvekîlê me dengê xwe bigîne me, neçar e ku dengê xwe bilind bike. Wezîrê Dadê ji ber pêkutiyên rayagiştî ya navneteweyî ev guhertin kirine û hikûmxwarên ku hevdîtina wan ên bi malbatan re kêm in anîne. Ev yek başkirin nîne. Ji ber ku li hemberî rayagiştî ya navneteweyî nekevin zorê, ev guhetin kirin. 5 kesên hatin vir jî tevlî tecrîdê bûn. Tecrîd ranebû, firehtir bû."

**'Fikarên me hene'**

Birayê Rêberê PKK'ê Abdullah Oclan Mehmet Ocalan jî, daxuyand ku hevdîtina vê hefteyê ya herî zor a 10 salan bûye. Mehmet Ocalan, anî ziman ku mafê axaftinê yê nîv saetî, 15 deqe ji bo rewşê hatiye veqetandin û ev tişt gotin: "Di hevdîtinê de birayê min ji min re wiha got, 'Cihê min ji yê berê xeraptir e. Rewş zor e. Ez bêhnê jî nastînim. Kezeba min digêje devê min.Em siyasetê nakin. Bila rayagiştî vê yekê baş bizanibe' şert û mercên birayê min girantir û zortir bûne." Mehmet Ocalan, destnîşan kir ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan derbarê rewaşa girtiyên nû hatine jî nirxandin kiriye û wiha dom kiriye: "Rewşa wan zor e. Pergalê ew feda kirine. Kes nikare li vir tehamûl bike. Min ji rayedaran re pirsî gotin, 'Debe heta mehekê em çareser bikin." Mehmet Ocalan, got ku wekî malbatê bi guman in. **STENBOL (DÎHA)**

## Ocalan: Navê vê yekê ne başkirin e

***LI SER*** navê serastikirin û başkirina şert û mercên girtîgeha ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tê de tê hiştin, piştî şandina 5 girtiyan derkete holê ku Ocalan neqil kirine odeyeke şert û mercên wê nebaştir.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 11 sal in di girtîgeha Yekkesî ya Îmraliyê de tê hiştin piştî şandina 5 girtiyan ji bo Îmraliyê, ragihand ku şert û mercên wî ji berê xirabtir bûne. Ocalan bi riya parêzerên xwe anî ziman ku odeya wî hatiye guhertin û wiha got: "Ez neqil kirime odeyeke nîvqasî odeya min a berê. Berhewaya wê ne baş e. Pencereya odeyê ne baş e. Gotin ev başkirin e. Cihê min ê berê baştir bû. Navê vê yekê ne başkirin e."

Rêberê PKK'ê Ocalan ev 11 sal in di girtîgeha Yekkesî ya Îmraliyê de tenê tê hiştin. Dewleta tirk ji ber nerazîbûnên gel û raporên Komîteya Pêşîlêgirtina li Îşkenceyê (CPT) ya Konseya Ewropayê, piştî 11 salan hefteya borî 5 girtî neqil kiribûn Îmraliyê. Ocalan di hevdîtina bi parêzerên xwe re de anî ziman ku wî hê jî girtiyên neqilkirine Îmraliyê nedîtine.

## Li Ocalan, doza 'Ocalan' vebû

Li Rihayê bi hinceta ku kesê bi navê Abdullah Ocalan di şahiyên hilbijartina 29'ê Adarê de dirûşma di lehê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan berz kiriye û îşareta serkeftinê kiriye û bi vî rengî "propaganda rêxistinê kiriye" doz hate vekirin.

Li bajaroka Gogana Xalfetiyê derbarê welatiyê bi navê Abdullah Ocalan ku beşdarî mîtînga DTP'ê bibû, bi hinceta di lehê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de dirûşm berz kiriye bi sûcdariya "propagana rêxistinî kiriye" doz lê hate vekirin. Di îdianameya Dozgeriya Komarê ya Amedê de hate diyarkirin ku di mîtînga bajaroka Goganê ya ku Hevserokên DTP'ê Ahmet Turk û Emîne Ayna jî beşdar bûbûn de girseyê dirûşmên di lehê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de berz kirine û "propaganda rêxistinî" kirine. Dozgeriyê di îdianameyê de îdia kir ku di nava girseyê de welatiyê bi navê Abdullah Ocalan jî heman dirûşme berz kirine û îşareta serkeftinê bilind kiriye.

Dozgerî bi vê îdiayê bi hinceta 'propaganda rêxistinê kiriye" doz vekir û heta 5 salan cezayê hepsê dixawze. Danişîna doza Ocalan li 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hate dîtin û biryara darizandina negirtî hate dayîn. **RIHA**

## Karayilan: Bêyî PKK'ê pelek jî nalive

Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Murat Karayilan got, 'ez ji rayedarên dewleta tirk re dibêjin, li Kurdistanê bêyî PKK'ê pelek jî nalive' û wiha pê de çû: "Bêyî PKK'ê ne mimkûn e ku tu pirsgirêk bêne çareserkirin. Hûn mecbûr in ku PKK'ê esas bigirin. Ne wisa hûnê nikaribin tiştekî bikin. Heke pirsgirêk dê bê çareserkirin, dê bi muxatabên wê re bê çareserkirin. Rêbazeke din a çareseriyê nîn e."

Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan got ku Hikûmeta AKP'ê mecbûr e PKK'ê esas bigire, pêvajo xitimiye. Karayilan axaftina Wezîrê Karên Hundir ê Tirkiyeyê Beşîr Atalay ku di heman demê de koordînatoriya pêvajoyê çareseriyê jî dike bi bîr xist û got ku di çarçoveya axaftina Atalay de tu çareserî pêk nayê. Atalay henekên xwe bi gelê kurd dike. Karayilan anî ziman ku bi serastkirinên ji rêzê pirsgirêka kurd çareser nabe û wiha pê da çû: "Pirsgirêka kurd, pirsgirêkeke bingehîn e. Bi gavên bi vî rengî çareserî pêk nayê."

Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Karayilan got, hikûmet bi rêbazên aborî û bi hin sererastkirinan hewl dide ku têkiliya gel ji PKK'ê qut bike û wiha got: "Her çiqas îro rêbazên cihe bi kar bînin jî armanca yek e."

**AKP dixwaze çi bike?**

Karayilan anî ziman ku hin gavên AKP'ê, mirov nikare wekî gavên ji bo çareseriyê bi nav bike û wiha dewam kir: "Divê mirov taktîka ku AKP dişopîne, rast fêm bike. Eger rast fêm neke, wê karibe bibe sedema xapandina hin kesan. Ji ber vê rast fêmkirina naveroka hewldanên AKP'ê gelek girîng e. AKP dibêje bi rêbaz û pêkanînên dewlet û statukoyê, encam bi dest nakeve. Ev rast e. Yanî dibêje, bi şîdet û zextê, nikarin kurdan bi Komara Tirkiyê re girê bidin. Heta niha ew hate ceribandin. Bi gotina Serokwezîr, tevî rêbazên leşkerî, aliyên pirsgirêkê yên psîkolojîk, dîplomatîk, sosyolojîk û aborî hene û divê ev alî jî, li ber çavan werin girtin."

**3 xalên Makeqanûnê**

Karayilan ji bo 3 xetên sor ên AKP'ê jî wiha got: "Yek, wê statuya kurdan nebe, yanî federasyon û xweserî nebe. Dudo; perwerdehiya bi zimanê dayikê nebe, sisê; wê operasyon nesekinin û azadiya Rêber APO nebe. AKP'ê ev her sê xal, wekî xetên xwe yên sor anîn ziman. Nunerên AKP'ê behsa guhertina Makeqanûn dikin. Helbet ev tişteke pêwist e. Divê Makeqanûn were guhertin. Bêguhertina Makeqanûn, çareserî nabe. Lê belê guhertina 3 xalên destpêkê yên Makeqanûnê li derveyê nîqaşan dihêlin. Di rewşeke wiha de jî em dipirsin: Dema ev 3 xal di Makeqanûnê de bimînin, hûnê netewa kurd û gelê kurd bixin ku derê? Di zîhniyeta wan de, wekî îrade qebûlkirina kurdan nîn e, ji ber vê guhertina 3 xalên destpêkê yên Makeqanûn li derve dihêlin."

**'Bêyî PKK'ê tiştek nabe'**

Karayilan bal kişand ser hemû xeterayan û got ku eger pêvajo wiha dewam bike, wê ji nû ve pêvajoya şer dest pê bike. Karayilan bang li rayedarên tirk kir û wiha got: "Li Kurdistanê, bêyî PKK'ê, pelek jî nalive. Nikarin ti tişt bikin. Ez ji vir dixwazim bang li Serokwezîr û hemû rayedarên dewletê dikim. Bê PKK'ê nikarin gavek jî biavêjin. Rêveberiya PKK'ê jî û Rêberiya wê jî heye. Dema em van gotinan tînin ziman, dibêjin girêdayî Îmraliyê ne. Na. Wiha bi nav kirina pirsgirêkê şaş e. Rêveberiyeke vê tevgerê heye. Sazîbûniya wê û sîstema wê heye. Herî kêm 50'î meclîsên civakên vê tevgerê pêk tînin hene. Lê serokê van hemûyan jî Rêber APO'ye. Eger wê pirsgirêk çareser bibe, divê bi muxatabê wî re rûnin, biaxivin û nîqaş bikin." **BEHDÎNAN (ANF)**

## Li Midyad û Kerboranê bi gel re civiyan

Ger û geşta endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên bi banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Qandîl û Maxmûrê hatibûn, li Mêrdînê bi civînên gel pêk anîn. Endamên komê diyar kirin ku ew ji bo aştiyê hatine û xwest her kes wisa zanibe. Endamên komê piştre Dêra Deyrul Umur û Komeleya Suryaniyên Midyadê ziyaret kirin.

Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên bi banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Qandîl û Maxmûrê hatibûn Tirkiyeyê, li navçeya Mîdyad û Kerboranê bi gel re hatin cem hev. Endamên komê li Salona Konferansê ya Şaredariya Kerboranê bi gelre civînek pêk anîn. Endama komê Elîf Uludag, diyar kir ku ji aliyê bi milyonan kesan ve hatine pêşwazîkirin û daxwaza tevan aştî û demokrasî ye. Uludag, destnîşan kir ku hêza gel tune be serkeftin jî ne pêkan e û wiha got: "Em bi banga Rêberê Kurdistanê Abdullah Ocalan ji Qandîl û Maxmûrê hatin. Lê mixabin partiyên ku aştiyê naxwazin gotin poşman bûne û hatine. Bila baş zanibin em tu carî poşman nebûne û nabin. Di sînor de jî pirsa poşaniyê ji me ne pirsîn. Ji xwe me got hûn vê pirsê ji me bikin em îfade nadin. Me got em ji bo aştiyê û bi banga Rêberê xwe hatine." Kom piştî civîna Kerboranê derbasî navçeya Mîdyadê bûn.



**Li Mîdyadê coşa gel**

Endamên koma aştiyê li navçeya Mîdyadê jî bi coşek mezin ji aliyê hezar kesî ve hatin pêşwazîkirin. Girsê di pêşwazîkirinê de dirûşmên "Bijî Serok Apo" û "PKK gel e, gel li vir e " berz kirin û pankarta "Em bi germahiya rojê Qasidê aştiyê slav dikin" vekirin. Endamên komê, li Xana Peluşka beşdarî civîna gel bûn. Li ser navê komê Bulent Aka, bal kişand ser niqaşên li ser çareseriya pirsgirêkê kurd û anî ziman ku di niqaşan de gavên berbiçav nayên avêtin. Aka, anî ziman ku her tim dixwazin her kesî bikin tirk û wiha got: "Bila qet neyê ji bîrkirin ku li Tirkiyeyê kurd jî dijîn û mafê kurdan jî heye. Divê mafê kurdî, çand û nasnameyê ji aliyê zagonan ve bêne parastin. Divê daxwazên gelê Maxmurê bêne qebûlkirin." Komên aştiyê piştî civînên gel çûn li Dêra Deyrul Umur û Komeleya Suryaniyan a Midyadê geriyan. **MÊRDÎN**

# Aloziya hilbjartinê bi dawî nebû

**Hefteyek berê qanûna hilbijartinê ya Iraqê hat qebûlkirin. Lê nîqaşên li ser mijarê tûjtir û gurtir bûn. Herî dawî El Haşîmî biryar veto kir û xwest ji nû ve bê dîtin. Amerîkayê jî bertekên tûj nîşanî vê da**



Tarik El Haşimî

Lijneya hilbijartinê ya Iraqê xebatên hilbijartinê rawestand. Hilbijartinên Iraqê di meha çileya 2010'an de divê pêk bê.

Cîgirê Serokomarê Iraqê yê Sunî Tarik El Haşîmî qanûna hilbijartinê ku heftiya borî parlamentoya Iraqê qebûl kiribû, veto kir û li ser vê daxuyanî hat dayîn.

El Haşîmî ji bo ku di qanûnê de nûnertiya ku daye hilbijêrên lu derveyî welat kêm dibîne qanûn veto kiriye. Tê xwestin ku qanûn ji nû ve di meclîsê de bê dîtin. Gelek welatiyên sunî ji ber şîdetê ji Iraqê reviyane û çûne welatên din.

Ji bo ku hilbijartin pêk bê divê her sê endamên Konseya Serokatiya Iraqê qanûna mijara gotinê mor bikin. Serokwezîrê Iraqê Nûrî El Malîkî vetokirina Haşîmî ya qanûnê şermezar kir. Malîkî destnîşan kir ku ev li hemberî demokrasî û pêvajoya siyasî zext û gef e.

**Li hesabên DYA'yê nehat**

Rêveberiya Amerîkayê diyar kir ku ew li dijî biryara vetokirina hilbijartinê ya Serokomarê Iraqê El Haşîmî, xemgîn bûne.

Berdevkê Wezareta Karên Derve Ian Kelly, bang li pêşengên iraqî kir ku lezgîn tevbigerin û pirsgirêkê çareser bikin.

Alîkarê Serokomarê Iraqê Tarik El Haşîmî, qanûna hilbijartinê ku di meclîsê de piştî 10 rojan hat erêkirin, veto kir.

Rêberê Sunî xwest ku xala yekemîn li parlamentoyê careke din bê nîqaşkirin.

Ev xal jî bi rêk û pêk kirina ji bo iraqiyên ku ji ber bûyerên şîdetê reviyane derveyê welat e.

Wisa tê texmînkirin ku aliyekî pir ê kesên ku reviyane Sunî ne (Bi taybetî jî kesên ku ji Bexdayê reviyane).

Tarik El Haşimî, dixwaze ku ji bo kesên ku piştî dagirkirina Amerîkayê ya 2003'yan ji welat reviyane û ku ji bo wan 5 kursî hatine veqetîn, derkeve 15 kursiyan.

Rayedarên komîsyona hilbijartinê ya Iraqê, aşkera kir ku wan li ser vetoya Haşimî, amadekariyên hilbijartinê taloq kirine. Ji endamên komîsyonê Qasim el Ebûdî, derbirî ku veto tê wateya taloqkirina hilbijartinan.

El Haşimî jî, dibêje ku ew bawer e dê di civînekê de ev pirsgirêk bê çareserkirin û hewce namîne ku hilbijartinên di 18'ê çileyê 2010'an de pêk bên, neyên taloqkirin.

**Talabanî jî guherîn xwestiye**

Serokomarê Iraqê Celal Talabanî, berê jî gotibû ku divê di qanûna hilbijartinan de guherîn çêbin û kursiyên ku ji bo kêmaran hatine veqetandin bibin 3 qat. Li gorî makeqanûna Iraqê, hilbijartin divê heta paşiya meha çileyê bên çêkirin. Lê Nûnerê Taybet ê Netewên Yekbûyî yê Iraqê Ad Melkert, anîbû ziman ku derbarê hilbijartnan de bi fikar e.

Ad Melkert, destnîşan kir ku ji bo hilbijartineke ku di demeke wisa kurt de bê çêkirin ne pêkan e ku zagon bi rastî bi cih werin. Melkert, berê jî gotibû ku ew bawer nake hilbijartin bi serkeftî pêk werin. DYA, jî difikire ku leşkerên xwe heta tebaxa 2010'an ji Iraqê bikişîne.

Hilbijartinên ku dê di 18'ê çile de li Iraqê pêk bên, ji bo vê pêvajoyê wekî gavekî girîng tê nirxandin.

**9 rêxistin vekişiyan**

Berpirsê Pêwendiyên Gel ê Komîsyona Hilbijardina Bilind a Serbixwe Abdulrahman Xelîfe got ku di nav de du sîyasetmedarên cûda û 7 rêxistin ji hilbijartinên Parlamentoya Iraqê vekişiyan û vekişandina wan jî hate erêkirin. Xelîfe got, tu rêxistinek siyasî ya kurdan derbarê vekêşandinê de serî li wan nedaye. Ji aliyekî din ve Serokê Komîsyona Hilbijartin a Serbixwe Ferec Haydarî bi daxuyaniyek aşkera kir ku sedemê vekêşandina wan her 9 rêxistinên siyasî nayê zanîn. Hemû alî di warê tevlêbûn an netevlêbûna hilbijartinan de azad in. BEXDA

## Heron li Israîlê vegerand

Demekê balafirên bê pîlot yên Heron ji rojeva Tirkiyeyê nediketin. Ji bo artêşa tirk wek hêzeke mezin dihat destnîşankirin. Lê derket holê ku Heron jî bi kêrî artêşa tirk nehatin û li Israîlê hatin vegerandin.

Du balafirên bê pilot yên bi navê Heron salek berê ji Israîlê hatibûn standin û li baregeha Êlihê hatibûn bicihkirin. Lê ji ber ku sûda dihat xwestin ji Heronan nehat girtin şîrketa Israîlê motora wan bi hêz kir. Li gorî vê motorên her du Heronên li Êlihê di cihê wan de û 8 heronên din jî dê li Israîlê bihata xurtkirin. Diviya ji 8 Heronên mayî 4 jê heta tebaxê bihatana Tirkiyeyê. Lê di pêvajoyê de ji ber ketina heronan û bikêrnehatina wan her wiha hinek ji konjoktura siyasî ev polîtîka têk çû.

Hê jî motor nehatine xurtkirin. Tê gotin ku dê heronên bi kêr nehatine jî dê bên vegerandin. Li ser vê gotegota, 'gelo ev proje dê bê betalkirin' zêdetir bû. Ji bo heronan di nav Tirkiye û Israîlê de bi 10 milyon dolar bazirganî hatibû morkirin ku ev tev ji berîka gelê tirk û kurd dertê. Lê li Tirkiyeyê derfet û çanda hesab irsîna rewşên wisa nîn e. Heta ku rewş û pergala Tirkiyeyê bi vî rengî be û neyê demokratîzekirin dê geşedanên wisa jî pêk bên. ENQERE

## 17 hezar penaber dibin DYA'yê

Cîgirê Wezîra Karên Derve ya Amerîkyê Eric Schwartz diyar kir ku Amerîka dê di sala pêşiya me de gelek penaberên iraqî qebûl bike.

Eric Schwartz çû Sûriyeyê serdana kampa penaberên iraqî jî kir. Li Sûriyeyê bi sed hezaran penaberên ji tirsa mirinê ji Iraqê reviyane Sûriyeyê û di kampan de dijîn. Schwartz destnîşan kir ku xebatên wan ên ji bo ji nû ve penaberan bi cih bikin dê bidome. Schwartz da zanîn ku problema herî mezin bersivandina pêwîstiyên penabêrên Iraqê ne.

Schwartz vegot ku ew dê di sala 2010'an ya malî de bi kêmanî 17 hezar penaberên iraqî li AmerÎkayê bi cih bikin. Derbirî ku îsal jî 6 hezar ji Sûriyeyê bi giştî 19 heza penaber hatine bicihkirin.

Ji bo piştgiriya malî ya 2009'an jî aşkera kir ku ji penaberên iraqî re 386 milyon dolar alikarî hatiye veqetandin. Schwartz bo ku penaber vegerin welatê we ji hikûmeta Iraqê xwest ku hê pirtir xebat bike.

Schwartz di çarçoveya serdana Şamê de bi Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Sûriyeyê Faysal El Mikdad re hat gel hev û li ser alikariya penaberên iraqî rawestiyan.

Piştî dagirkirina Iraqê (2003) û şûnve bi kêmanî 4 milyon iraqî ji cih û warên xwe reviyane û bûne penaber. Ji vana gelek jê vegeriyabin jî hê 1.5 milyon iraqî li dervayê welat di rewşa penaberiyê de dijîn. Pirtirên vana jî li Urdun û Sûriyeyê di kampan de tên girtin. ŞAM

## Serokê FBI'yê xirab peyivî



Serokê FBI'yê Robert Mueller ji nişka ve pêr hat Serdana Tirkiyeyê. Piştî çend hevdîtinên balkêş di heman rojê de jî çû. Li ser serdanê Sefîrê Amerîkayê yê Tirkiyeyê aşkera kir ku serdan ji bo dijîtiya PKK'ê pêk hatiye û bi hevdîtinan ev dijîtî hatiye xurtkirin.

Mueller pêr ji Pakistanê bi balafireke taybet û di nav ewlehiyeke berfireh de hate Enqereyê. Mueller di serdanê de bi Cîgirê Serokwezîrê Tirkiyeyê Cemîl Çiçek, Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn û Midûrê Giştî yê Ewlehiyê Oguz Kagan Koksal re hevdîtinan kir.

Der barê serdanê de sefîrê Amerîkayê daxuyanî da. Diyar kir ku Washington li dijî PKK'ê bi Tirkiyeyê re hevkariya dikir nû kiriye. Hat gotin ku ji vir û şûn ve li henber 'terorê' hê bêtir hevkar dê tev bigerin. Çiçek jî hatina Serokê FBI'ê nirxand. Di nirxandinê de got ku Tirkiye-Amarîkayê hevkariya nav xwe nû kirine. Li êli se nukleer û qampa Maxmûrê ranewestiyane. Çiçek destnîşan kir ku ev mijar mijarên krîtîk û pir girîng in, ji ber vê jî ne rast e ku kîtekîteyên van mijaran aşkera bikin.

Daxuyaniya Çiçek balkêş hat dîtin û di nav xwe de nakokiyan dihewand. Mueller serokê rêxistineke îstîxbarî ye û ji ber vê jî pirtir li pişt dîwaran hevdîtinên tarî pêk tînin. ENQERE

## Şebekeya taciran rûxandin

Wezareta Koçberiya Fransayê şebekeya ku bazirganî û taciriya mirovan dike, bi dest xist

Di encama operasyoneke hevbeş de li Fransayê 13 û li Ingilîstanê jî 9 kes hatine binçavkirin. Hat destnîşankirin ku ev şebeke ji erbên Iraqê pêk tê.

Endamên vê şebekeyê koçberên ku dihatin Fransa yê dibirin welatên mîna Îngilistan û welatên din ê başûrê Ewropayê. Wezarîrê Koçberî û Nasnameya Neteweyî Eric Besson derbarê vê mijarê de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate gotin ku ev şebekeya ku hatiye girtin heta niha bi kêmanî 2 hezar penaber di riyên qaçax de derbasî Îngilîstanê kirine û bi vê yekê tê texmînkirin ku vê şebekeyê 20 milyon ewro bi dest xistiye. Li gor daxuyaniya wezîr di sala 2009 an bi giştî 126 şebekeyên wise hatine rûxandin. PARÎS

## Ji bo sondê li hev civiyan!

***QABÎL* -** Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Ahmet Davutoglu ji bo ku beşdarî merasîma sondxwarina Serokomarê Afganistanê Hemîd Qarzayî bibe çûAfganistanê û li Afganistanê jî bi Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clintonê re di taştiyê de hat cem hev. Taştê li sefaretxaneya Amerîkayê ya Qabîlê hat dayîn û wezîrên welatên ku leşker dane ISAF'ê di teştê de hatin gel hev. Balkêş e ku destûr nehat dayîn ku çapamenî ji civîna taştiyê dîmen û wêne bikêşin. Li Afganistanê ji bo sondxwarina merasîma serokomariyê duh bi aweyekî fermî betlane hat îlankirin. Hemû riyên ku diçin Qabîlê bi fikara ewlehiyê hatin girtin. Di nav cade û kolanên Qabîlê de jî tedbîr hatin girtin. Davudoglu piştî taştê hat xwarin ji bo merasîmê çû Qesra Serokomariyê. Li vir jî bi Qarzaî re hevdîtinên du alî hatin kirin.

## Îranê plana NY'ê red kir

***TEHRAN* -** Wezîrê Karên Dervê yê Îranê aşkera kir ku wan plana Netewên Yekbûyî ku dibêje uranyûmê bişînin welatekî din, red kirine. Manuşer Muttaki derbirî ku ew ligel vê yekê dixwazin ku di nav Îranê de, uranyumê bi sotemeniyê re bedêl bikin. Wezîrê Karên Dervê yê Amerîkayê Ian Kelly anî ziman ku ew li bendê ne ku Îran bersiveke fermî bide Daîreya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî. Kelly Muttaki jî bi lêv kir ku ji axaftinên wan tiştekî erênî derneketiye. Daîreya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî pêşniyar kiribû ku Îran uranyuma xwe bişîne Rûsya an jî Fransayê û li wê bê dewlemendkirin. Îran dibêje ew dixwazin uranyumê di qada tendurustiyê de bi kar bînin. Lê welatên rojavayî îdia dikin ku Îran, ji bo çekan uranyumê dewlemend dike.

## Piştgiriya ji bo Obama

***CONNECTICUT* -** Piştgiriya gelê Amerîkayê ya ji bo Barack Obama kêmtir dibe. Li gorî lêkolîneke nû, derket holê ku piştigiriya gel a ji bo Obama, ket binê ji sedî 50'yî. Li Eyaleta Connecticutê, li zanîngeha Quinnipiacê lêkolînek hat kirin û derket holê tenê ji sedî 48'ê gelê Amerîkayê piştgiriyê dide Obama. Ev encam di meha borî de ji sedî 50 bû lê di nav mehekê de ji sedî 2 kêm bû. Pispor ji bo vê yekê dibêjin ku ji ber Obama tiştên ku ji gel re dibêje bi cih nayne baweriya gel kêm dibe.

www.arshivakurd.org




## Li dijî recmê kampanyaya îmzeyan

Li navçeya Cizîra Şirnexê li hemberî recmkirina jinan a li Îranê kampanyaya îmzeyan hate destpêkirin. Li Cizîrê di serî de recmên li Îranê û şîdeta li hemberî jinan a li hemû deverên cîhanê kampanyaya îmzeyan hate destpêkirin. Ji bo kampanyaya îmzeyan Tevgera Jinan a Demokratîk û Azad (DOKH) li ber avahiya hikûmetê ya Cizîrê stand vekir. Jinan eleqeyeke germ nîşanî kampanyayê da. Îmzeyên ku bên berhevkirin dê ji Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) re bên şandin. Endama DOKH'ê Hanim Onur got ku wan ji bo şîdet û recma li hemberî jinan protesto bikin kampanyeke wisa daye destpêkirin. **ŞIRNEX**





# Ji jinan çalakiyên li dijî şîdetê

**Jinan di çarçoveya fînala kampanyaya 'em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye' de li gelek bajarên Kurdistan û Tirkiyeyê çalakiyên cur bi cur û rengîn li dar xistin**




Jinên kurd ev salek e kampanyaya 'em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" didomînin. Kampanya bi çalakiyên cur bi cur ber bi dawiyê ve diçe. Jinên kurd di çarçoveya kampanyayê de li gelek bajar û navçeyên Kurdistan û Tirkiyeyê panel, civîn û semîneran li dar dixin. Her wiha kon tên vedan û belgefîlm û şano têne pêşandan.

Jinên kurd di çarçoveya kampanyaya "em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" de 25'ê mijdarê de li Rihayê kon vedan, li Îzmîrê daxuyanî dan, li Amedê tura otobusê li dar xistin. Her wiha li Êlihê jî jin hatin ba hev.

**Bi sedan jin hatin ba hev**

Meclîsa Jinan a Rihayê, li Rihayê kon vegirt. Rêvebera Meclîsa Jinan a DTP'ê Ozlem Yanat, diyar kir ku vekirina kon fînala kampanyaya "Em ne nemûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" ye.

Meclîsa Jinan a Rihayê, bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Piştevaniya Jinê û Şîdeta Navneteweyî ya li Dijî Jinê, li ber Kargeriya Karakoyunê çalakiya vekirina kon pêk anî. Çalakiya ku fînala kampanyaya "Em ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" ku Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) salek berê dabû destpêkirin. Cîgira Hevseroka Koma DTP'ê ya Parlementoyê Gultan Kişanak, Parlementera Êlihê Ayla Akat Ata, Parlementerê Rihayê Îbrahîm Bînîcî, Serokê Rêxistina DTP'ê ya Rihayê Îbrahîm Ayhan û bi sedan ses beşdarî çalakiya vekiran kon bûn.

Kon bi wêneyên jinên rastî şîdete hatine hate vekirin û panqartên "Bila şîdeta li dijî jinê bi dawî bibe", "Em ne namûsa tu kesîne, namûsa me azadiya meye" bi konve hate daliqandin. Rêvebera Meclîsa Jinê ya DTP'ê Ozlem Yanat, destnîşan kir ku fînala qampanyaya "Em ne nemûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" dê pêk bînin. Yanat, sedema bijartina Rihayê jî wiha vegot: "Rihê ji cihê ku herî zêde jin lê rastî şîdetê tên e. Li vir jin di bin navê namûs, torêyê de he roj rastî îşkenceyên cuda tên. Ji bo ronîkirina vê yekê me Riha bijart."

**'Divê e jin bigihîjin azadiyê'**

Piştî Yanat, bername pêşkêş kir, Gulten Kişanak û Ayla Akat Ata, axaftin kirin. Kişanak û Akat Ata, bi lêv kirin ku li tevahiya cîhanê jin rastî şîdêtên cûda tên û bi teybetî ev şîdet li Tirkiyeyê zêdetir tên jiyîn. Kişanak, anî ziman ku lazime êdî jin bi hişmendiya zayendeya civakî neyê destgiritn û wiha axivî: "Jin êdî tenê li mal û di karê zarok mezin kirinê de na, divê li tevahiya qadên civakî xwe bîne ziman û bigîhîjê azadiya xwe."

Di çalakiya ku tedbîrên ewlehiyê yên berfireh hatibûn girtin de, jinan bi coşek mezin dirûşmeyên "Jin jiyan azadî", "Destên dirêjî jinê dibin, bila bişkên", "Em jinin, dayik in piştevanê aşîtiyê ne" berzkirin. Çalakî dê bi semîrên ji bo jinana bi beşariya parlementerên jin li taxên Suleymaniyê û Eyyubiyê pêk bînin.

## Jin li her derê rastî êrîşan tên

**ŞAREDARA** Licê Fîkriye Aytîn, di panela têkildarî 25'ê Mijdarê de axivî û diyar kir ku jin bi her alî rastî êrîşa mêr tên.

Navenda Piştevaniya Jinê ya Nûjiyan, têkildarî 25'ê Mijdarê Roja Têkoşina li Hemberî Şîdetta li dijî Jinê bi dirûşmeya "Em jin in, ne namûsa tu kesî ne, namûsa me azadiya me ye" li navçeya Licêyê panelek pêk anî. Di panelê de Şaredara Licêyê Fîkriye Aytîn, Berpirsiyara Komeleya Jinan a SELÎS Civaknas Nuran Duman, Prz. Evîn Akgul amade bûn. Li ser navê DOHK'ê daxuyanî xwend û diyar kir ku di sala 2002'an de 66 jin hatin kuştin, di sala 2007'an de zêdeyî hezar jinî û îsal 2009'an 953 jin hatin qetilkirin. Duman, da zanîn ku êrîş û şîdeta li dijî jihê her ku diçe zêde dibe. Şaredara Licêyê Fîkriye Aytîn jî diyar kir ku êrîşa li dijî jinê didome û wiha axivî: "Êrişa li dijî jinê li Iraqê, Lubnanê, Afganîstanê û li her derê zêde dibe. Tenê ne ax, laşê jinê jî tê dagirkerkirin. Jin ji her alî de rastî êrîşa mêr tên. Jin her roj li ser navê namûsê rastî zilma mêr tê." **AMED**



Meclîsa Jinan a DTP'a Îzmîrê, bi boneya 25'ê mijdarê Roja Piştevaniya Jinan û Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinan a Navneteweyî ji bo xwe bigihînin jinên li bajar dê "Konê Aştiyê" vekin û bi beşdariya parlamenterên jin ên DTP'ê jî li gelekî taxan, civînên jinan li dar bixin.

Meclîsa Jinan a DTP'a Îzmîrê, bi boneya 25'ê mijdarê Roja Piştevaniya Jinan û Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinê ya Navneteweyî dê li Îzmîrê hin çalakiyan li dar bixe û balê bikşînê ser şîdeta li hemberî jinê ya ku çavkaniya xwe ji dewlet û zilam digire. Meclîsa Jinan a DTP'a Îzmîrê û Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê di 21'ê mijdarê de li ber Suberbangk a Kevin a Konakê dê "Konê Aştiyê" vekin. Di kon de dê balê bikşînên ser şîdeta li hemberî jinê û dê şano û sînevîzyon bên nîşandin û gotûbêjan çêkin. Parlamenterên DTP'ê Sevahîr Bayindir û Fatma Kurtulan jî dê werin serdana "Konên Aştiyê". Di heman rojê de jî li navçeya Gazîemîr û bajaroka Karabaglarê bi beşdariya parlementerên jin, cîvênên jinan bê li dar xisitn. Li NÇM'a Îzmîrê jî, têkildarî 25'ê Mijdarê dê panelek pêk bê. Seroka DTP'a Îzmîrê Mukaddes Kubîlay, der barê xebatan de diyar kir ku 25'ê mijdarê li hemberî şîdeta li dijî jinên cîhanê, rojek girîng e û wekî partiyê li Îzmîrê dest bi xebatan kirine. Kubîlay, destnîşan kir ku li Tirkiyeyê jin li hemberî şîdeta ku çavkarina xwe ji dewlet û zilam digire, mafên xwe yên zagonî nizanin û da zanîn armanca wan xwe gihandina tevahiya jinên li Îzmîrê ye. Endama Meclîsa Jinê ya DTP'ê Esma Urfali jî, banga beşdariya li jinên piştevanên aştî û li hemberî şîdetê kir ku beşdarî çalakiyên wan bibin. Li Êlihê jî jin hatin ba hev. Jinan li Sînemaya Yilmaz Guney sînevîzyon temaşe kirin. **RIHA / ÎZMÎR / ÊLIH (DÎHA)**

## Cudaxwazî bi dawî nabe

Di lêkolîneke ku li Îngilistanê hate kirin de derket holê ku cudahiya mezin a di navbera mehaneya jin û zilaman de dom dike. Îngilistan ligel ku di nava 7 welatên herî dewlemend ên cîhanê de ye jî, derket holê ku hîn jî ji bo heman karî mehaneyên wekhev nayê dayîn û cudahiya herî mezin a di navbera mehaneyan de jî li qadên ku pisporiyê ferz dike, dertên. Li van qadan cudahiya di navbera mehaneyan de ku derdikeve ji sedî 26'an di karên fabrîkayan û rêveberiyan de jî ji sedî heta 20'î ye.

Li gorî daneyên Departmana Îstatîkên Navneteweyî (ONS) ya Lijneya Îstatîstikên fermî ya Îngilistanê, cudahiya di navbera mehaneyên jinên ku bi zilaman re heman karî dikin, di sala 2009'an de, didome. Cudahiyên di navbera mehayên jin û zilaman de, di karên ku pisporiyê dixwaze de bêtir dibe, lê cudahiya di navbera jin û zilamên di karên normal de dixebitin bi asteke biçûk kêm bûye. Li gorî daneyên hatine bidestxistin, jin û zilamên di karên tesîsatê û gulfiroşiyê de dixebitin, di beramberê heman karî de mehaneyên cuda digirin. Li van qadan mînak, ku zilam 10 TL'yan digirin, jin 7 TL 40 kuruşan digirin. Li gorî daneyên ONS'ê yên cudahiya di navbera mehaneyan de li gorî asta kar jî diguhere. Mînak; cudahiya di navbera mehanên jin-zilam di qada berfireh a karê gulfiroşiyê û tesîsatê de ku piranî qadên perwerdehiya pîşeyî ferz dike, zêdetir tê dîtin. Li van qadan zilamên heman karî dikin ji jinan di warê pereyê saetan de ji sedî 26 zêdetir distînin. Ligel karên îdarî di yên wekî fabrîka, atolye û îmalatxaneyan cudahiya di navbera mehaneyan de gelekî balkêş e. Li van qadan jî zilam mehaneya xwe ji sedî 20 ji jinan zêdetir digirin.

Li gorî daneyên her sal di encama hevdîtinên bi 177 kesan re, di karê ku mehaneyên asgarî tên dayîn de ligel cudahiya di navbera mehaneyên jin û zilaman di asta jêr de ne jî, dîsa jî ji sedî 12 ferq tê dîtin. Qada bazargeriyê ya ku cudahiya di navbera mehaneyên jin û zilaman de herî kêm e ji sedî 3.8 in. Li gorî daneyên ONS'ê, di tabloya mesaiyên zêde de heyîna cudahiya di navbera mehaneya jin û zilaman kişf dibe. **AMED**

## 'Tu jî şîdeta li hemberî jinan red bike'

Midûriyeta Jin û Malbatê ya girêdayî Daîreya Xizmetên Civakî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji bo ku li hemberî şîdeta li dijî jinan bihistiyarî pêk bê bi slogana "Tu jî şîdeta li hemberî jinan red bike" di nava bajar de tura otobusê pêk anî. Di turê de jin di warê mafên qanûnî û civakî de hatin agahdarkirin.

Bi munasebeta 25'ê Mijdarê li taxa Benusenê tura otobusê hate lidarxistin. Wêneyên jinên ku rastî şîdetê hatine û sloganên weke "bedena me, keda me û nasnameya me ya me ye", "kolan dê bi me azad bibin", "ne li hemberî jinan, li hemberî kujeran bend" û "Tu jî şîdeta li hemberî jinan red bike" li ser otobusê hatin bicihkirin. Jin bi zarokên xwe re tevli tura otobusê bûn. Di hundirê otobusê de jin ji aliyê psîkolog û hiqûqnasan ve der barê mafên xwe de hatin agahdarkirin. Parêzer Aygul Demîrtaş dema ku jin rastî şîdetê tên dê xwe çawa biparêzin vegot. Psîkolog Nurcan Ercan jî bandora şîdeta a li ser jinan axivî.

Nurcan Ercan got ku dema ku jin rastî şîdetê tên pir caran bêdeng dimînin û wiha axivî: "Ji ber ku di nava civakê de şîdet rewa tê dîtin jin jî bêdeng dimînin. Nizanin ku dê çi bikin. Dibêjin kes xwedî li wan dernakeve û ji ber vê yekê jî bêdeng dimînin."

Pispora xizmetên Civakî Halîme Sariyê jî der barê stargeha şaredariyê de agahî da û şertên serlêdanê vegot. Jinan der barê pirsgirêkên taybet xwe yên taybet de jî pirsên xwe kirin.

Piştî tura nava bajar otobus çû Ekîn Parkê û li vir çay vexwarin û sohbet kirin. Jinan li vir ji bo çalakiyê kêfxweşiya xwe anîn ziman. Jinan xwest ku xebatên bi vî rengî bidomin. Xebatên bi vî rengî dê li taxa Azîziye û Hasirliyê jî dê bê kirin. Her wiha ev otobus dê di navbera xeta Zanîngeh û Zumrutkentê de 2 mehan bixebite. **AMED**




www.arsivakurdi.org


## Ji Weşanên Avesta pirtûkên destan



Ji Weşanên Avesta bi armanca hêsantirkirina xwendina kurdî rêzek pirtûkên destan derketin. Pirtûkên bi navên Heving, Meseleya Wijdanê û Di Xew De mijarên cihê vedibêjin. Pirtûkên destpêkê ji tekstên pirtûkên bi buhayeke guncaw tên belav kirin, bi navên, 'Di xew de' ya ji hêla Cemîl Saîb ve hatiye nivîsandin, 'Meseleya Wijdanê' ya Ahmed Muştar Caf û 'Hevind' a ji hêla Celadet Alî Bedîrxan ve hatine nivîsandin in. Di pirtûka 'Di Xew De' de mijarên civakî bi şibandina xewê tên vegotin. Di pirtûka 'Meseleya Wijdanê' de Caf li ser gengeşiyên civakî yên Rojhilata Navîn radiwest e. STENBOL

# Lîstik îngilîzî, derhêner kanadayî, lîstikvan kurd

# Zimanê Çiya



Çetîn ALTUN - AMED

Şanogerê kanadayî Luciano Iogna demek e li Amedê ji bo şanogerên Şanoya Şaredariya Bajarê Mezin atolyeya şanoyê li dar xistiye û dixwaze di encama atolyeyê de lîstika Harold Pinter ya bi navê 'Zimanê Çiya' derxin ser dikê. Iogna anî ziman ku heta niha di lîstikên ku civakê eleqedar dikin û pirsgirêkên civakê vedibêjin de cih digire û Iogna xwe ne wekî hunermendê şanoyê lê wekî karkerê şanoyê bi nav dike.

Çiya' dest bi provayên lîstikê kirine û dixwazin lîstikê di 11'ê kanûnê de derxin ser dikê û pêşkêşî şanohezan bikin. Iogna diyar kir ku ji bo li Amedê bilizin li ser du lîstikan sekinîne û li ser sedema bijartina lîstika 'Zimanê Çiya' ev tişt gotin: "Em li ser du lîstikan sekinîn. Lê bandora lîstika din bi qasî lîstika 'Zimanê Çiya' ne zêde ye. Zimanê vê lîstikê jî dişibe zimanê şanoya forumê. Ji ber wê hat bijartin. Mijara vê lîstikê yek ji pirsgirêkên herî bingehîn ên gelê kurd e."

**Luciano Iogna demek e li Amedê atolyeya şanoyê vekiriye û amadekariyan dikin ku lîstika 'Zimanê Çiya' bilîze. Şanoger diyar kir ku xwe wekî karkerê şanoyê bi nav dike û di lîstikên xwe de cih dide mijarên civakî**

Şanogerê bi eslê xwe kanadayî Luciano Iogna heta niha li gelek welatên cuda yên wekî Kanada, Brezîlya, Ukrayna, Hindistan, Îtalya, Îspanya, Awisturya û gelek welatên din atolyeyên şanoyê li dar xistine û perwerdehiya şanoyê daye. Iogna ev demek e ji bo şanogerên Şanoya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê atolyek vekiriye û di atolyeyê de tecrubeyên xwe bi şanogerên kurd re parve dike. Piştî atolyeya hefteyekê dom kir, niha li ser lîstika Harold Pinter ya bi navê 'Zimanê

Di atolyeyê de bi wergera wergêr Xezal Arslan ve xebat bi zimanê kurdî tên meşandin. Wergera bi kurdî bi xwesteka Luciano Iogna ve pêk hatiye û şanogerên kurd jî ji ber ku bi kurdî perwerdehiyê dibînin û amadekariya lîstikê dikin kêfxweşiya xwe anîn ziman.

**'Têgihîştineke burjuwaziyê'**

Iogna bil êv kir ku her çiqas di lîteratura şoneyê de şanogerî wekî hunermendê şanoyê bê binavkirin jî ew xwe wisa nabîne û xwe wekî karkerê şanoyê bi nav dike û Iogna wiha axivî: " Heta niha ez di hemû beşên şanoyê de xebitîme. Di demên dawî de piranî li ser lidarxistina atolyeyan disekinim û perwerdehiyê didim. Di navbera karkeriya şanoyê û hunermendiya şanoyê de di warê bikaranîna peyvan de cudahî heye. Li gorî min peyva hunermendî yan jî artîstî peyveke burjuvazî ye. Ez ji şanoyê hêz digirim, wekî karekî dibînim û vî karî dikim ji ber wê ez xwe wekî karkerî şanoyê bi nav dikim. Di şanoyê de komeke elît heye û ev kom xwe wekî hunermend bi nav dikin lê ez xwe di nav wan de nabînim."

**Mijarên bi peyam**


Şanoger Iogna anî ziman ku ji ber ku hatiye Amedê û tevî şanogerên kurd dixebite kêfxweş e û diyar kir ku heta niha li ser mijarên civakê eleqedar bikin karê şanoyê kiriye û piranî cih dide şanoyên ku peyamê bidin civakê. Iogna der barê mijarê ev tişt gotin: "Mijarên şanoyên ku heta niha min di nav de cih girtine civakî bûne. Di şanoyan de ji kêfxweşiyê zêdetir cih didim lîstikên ku peyamekê bide civakê." Iogna da zanîn ku di mijarên civakî de jî herî zêde cih dide kesên seqet, karkeran, sendîqeyan, pirsgirêka jinan û penaberan. Iogna bi lêv kir ku li welatên atolye li dar xistiye piranî bi tevî gelên wekî kurdan rastî neheqî û bêedaletiyê ten re xebitiye.

Luciano Iogna got ku derbarê şanoya kurdî de agahiyên wî ne zêde ne û kurd dikarin pirsgirêkên xwe bi riya şanoyê bi hemû civakê re parve bikin û şanoyê wekî amûrekî bi kar bînin.



## Teknîka şanoya bindest dixebitin

**LOGNA** anî ziman ku di atolyeya ku li Amedê didin de teknîka şanoya bindest û foruma şanoyê bi kar tînin. Iogna der barê mijara teknîka şanoya bindest de ev tişt gotin: "Em ji bo vê lîstikê jî teknîka şanoya bindest bi kar tînin. Teknîka bingehîn ku herî zêde em bi kar tînin teknîka forum e. Di bin banê şanoya bindest de teknîkên cuda cuda hene. Li vir jî a bingehîn şanoya forum e. Di heman demê de jî şanoya ku nayê xuyakirin ya rojnameyê heye. Ez wekî pirsgirêkên civakî li wan gişî mêze dikin. Dema şanoya civakekê bê çêkirin divê bê zanîn ku pirsgirêkên civakî çi ne. Divê bi teknîkên ku bên bi kar anîn ve zextên li ser civakê tên meşandin bên dîtin. Divê mirov lîstekî baş analîz bikin û wisa bilîzin. Şanoya Forumê bêtir li ser çareseriyan jî disekine. Çareserî çi ne wan jî li ber çavan radixe." Şanogerê kanadayî Iogna diyar kir ku di şanoya forum de temaşevan ne pasîf in û ew jî parçeyekî lîstikê ne.



# 'Ji Kevneşopiya Ber bi Dîjîtalê ve'



Li Amedê di salona pêşangehê ya Navenda Çanda Amedê de pêşangeha Osman Alakuş ya bi navê 'Ji Kevneşopiyê Ber bi Dîjîtalê ve' vebû. Di xebatên Alakuş de di serî de mîrata dîrokî û nasnameya çandî ya heremê û Amedê cih digirin. Di pêşangehê de berhemên ku hêmayên çandê vedibêje bi tarzê wêneyên fîguratîf, tasarimên tîpografik, çapên xweser û tarzên din hatine çêkirin cih digirin.

Serokê Beşa Perwerdeha Hunerên Bedew a Zankoya Perwerdehiyê ya Ziya Gokalp Alî Osman Alakuş xebatên xwe tenê wekî nirxên plastîk nabîne û her wiha wekî zimanê çandî jî dibîne. Hunermend di xebatên xwe de tiştên ku li Amedê her roj tên dîtin lê nayên ferq kirin dide xuyakirin. Çawa Ingres di xebatên xwe de bi tarzên çapên xweser, wêne û grafîkên tasarimê ve vedibêje, Alakuş jî bajarê surên reş Amedê bi tarzên cûr bi cûr ji girseyan dide nasîn. Hunermend çand, ziman, bawerî û nasnameyên cûda ku bi sedan salan li Amedê di nav hev de jiyane bi riya hunerê di heman pêşangehê de cih didê. Di konsepta xebatên Alakuş de hemayên pirçandiyên yên bi riya wêne û nîvîsan bûne objeyên hunerê yên pirçandiyê bi zimanekî rasteqîn ve bi riya berhemên hunerî yên cûda hatine ziman. Hunerhez dikarin heta 10 çileyê pêşangeha Alî Osman Alakuş bibînin.

Alî Osman Alakuş li Amedê ji dayik bû. Li zanîngeha Dîcleyê xebatê xwe yên akademîk didomîne û serokê Beşa Perwerdeha Hunerên Bedew e. Heta niha li ser ser huner û dîroka hunerê di çapemeniyên netewî û navnetewî de gelek gotar nivîsand. Di nav kordineya projeyên çandên cûda de cih girtiye. Her wiha gelek pêşangehên şexsî vekiriye. AMED

# Ji *Aram Tîgran* newayê herî dawî

Berhemên nû yên hosteyê mezin ê muzîka kurd û esil ermen Aram Tîgran ku berî biçe ser dilovahiya xwe li ser xebitî, ji Kom Muzîkê derketin.

Berhemên nû yên hostayê mezin ê muzîka kurdî û esil ermen Aram Tîgran ên herî dawî li ser xebitî bes ji ber çûyîna wî ya bêdeme ne qediyayîn ji Kom Muzîkê bi navê, "Xelatek ji bo hezkiriyên Tîgran ên li erdnîgariya Rojhilata Navîn" derket. Di albûmê de 16 berhemên Tîgran li stûdyoyê li ser xebitî û heta niha nehatine weşandin, di albûmê de cih digirin. Berhemên herî dawî Tîgran diyarî hunera gelê kurd û hezkiriyên xwe kirîn, endamên klasîkbûnê yên pêşerojê ne.

**Ji Tîgran klasîkên nû**

Di albûma Tîgran a herî dawî ya bi navê "Gelê Kurd Dest Bidin Destê Hev" de stranek jî ermenkî cih digire. Di albûmê de her wiha stranên, "Gehîşt Serxwebûnê", "Ew Meşa Te", "Delal Hayê", "Penaber", "Gêkêlê Sîrunyar", "Gelê Kurd", "Gelo Ew Ki Bû", "Eman Neman", "Dîlbera Min Dîlber", "Bi Hesreta Yêrîvan", "Lo Şivano", "Anê Can", "Kurko Dîno", "Tûzik (Gihaye ki xweş)", "Lo Lo Pismamo", "Rojbaş Diyarbekir" cih digirin.

**Nehiştin li Amedê bê veşartin**

Tîgran ku bi eslê xwe ermen e di sala 1934'an de li Qamişloyê ji dayîk bûye. Tîgran ku ji 20 saliye xwe heta çûyî ser dilovaniya xwe li ûdê xist, bi kurdî, ermenî û erebî stran gotin. 18 salan li Radyoya Êrîvanê xebitî. Tîgran ku cîhana xwe ya muzîkê li vir mezin kir, ji sala 1995'an derket Ewropayê û li wir xebatên xwe meşandin. Tîgran ku yekem car ji bo beşdariya Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê hate bajarê bav û kalan, beşdarî Newroza 2009'an a Amedê jî bû. Tîgran di 8'ê tebaxê de li paytext Atînaya Yewnanîstanê di encama rawestiyana dil de jiyana xwe ji dest da. Li ser wesîyeta Tîgran ji bo li Amedê bê veşartin kurd ketine nav hewildanê lê rayedarên tirk destûr nedan naaşê Tîgran. Li ser vê yekê Tîgran li paytext Brûksela Belçîqayê hate veşartin. STENBOL





www.arsivakurdi.org











Evdile Koçer
evdilekocer@yahoo.com

## Li Zozanên Facebookê

Nebêjin ev mîrata Facebook jî çi ye, nexwe em ê rezîl bibin heyran. Ji ber ku kesê herî dawî di înternetê de vê malperê kifş kiriye jixwe ez koçerê xwedê me.

Heta niha hemû dawetên ku ji hevalên ji we ne çêtir ji min re dihatin, min piştguh dikir û serdana vê mîrata Facebookê nedikir...

Weke kesê ku ji dewra şerê sar mabe, min di kozika xwe de 'berxwedan' dikir û digot bila Facebook were serdana min bike, ma ew kî ye, li ser çi dînî ye, kemala wî çi ye, pêlava wî çend nimre ye, ji kîjan êl û eşîrî ye û filan û fistan…

Di ber re jî min digot, ev Facebook malpereke CIA, KGB, MOSSAD, MÎT û TÎTê ye û dixwazin yekîtiya kurdan ji hev bixin. Lê dema ku min serdana Facebookê kir, min fêm kir ku jixwe di wir de yekîtiya kurdan ji ber xwe de çêbûye, belkî pêdiviya wan bi koçerekî wekî min nemabe jî ezbenî. Divê ez xwe ji Xwedê nekim ku camêran di Facebookê de gelekî qedrê min girtin. Hindik mabû ku serê min bişûştana û min tê de bikirana zava jî heyran.Zekî Ozmen bi qerf û henekên xwe yên botanî ve, civata kurdî di Facebookê de li me germ kir. Dilgeş Dilsoz parçeyek ji romana xwe ya dawî "Goştê bê hestî" ji min re xwend û pirqînî bi ser min xist. Rizo Xerzî hemû şîfre û kodên nepenî bi vegotina xwe ya Qamişlokî ve deşîfre kir û nanê CIA û MOSSADê di Facebookê de birî alahwekîl.

Bêrîvan Doskî bi çend gotinên xwe yên helbestyane ve koçeriya xwe nîşanî min da û ez birim Zozanên Şerefdînê. Lê tişta herî xweş Dezayê min Kenan ez bi zazakî pêşwazî kirim û fatîhayekî jî li ser kurmancên tirkî-nexweş xwend. (Amîn Deza!) Wafî ji Cizîra delal ji me re dermanên kurdî şand. Alî Gurdilî xwe neşeqand û ji Îzmîrê merşika felsefeya kurdî li ber nigê me raxist û ji me re behsa felsefeya Zerdeşt kir. Elî Fîkrî Işik bi sebreke mezin ve taktîk û stratajiyên spora kurd nişanî me da. Sîdar Bengîn ji min re behsa pîvanên nifşa nû kir. Ez dibêjim qey min siya Samî Tan û Şêx û mûrîdên wî û Îkram Balekaniyê me jî li wir dît. Ji siya wan xuya dikir ku bi tiştên gelek 'girîng' ve mijûl bûn.

Helbet nexweşiya me kurdan ya bi tirkî di wir de jî xwe diwelidîne. Bilbilên kurd xwe di Facebookê de berdidin nav zindana zimanê tirkî û rihê sohbeta xwe bi destê xwe ko dikin, diçilmisînin û serê we xweş be dikujin.

(Yawww, eva hûn dibînin ev nexweşiya tirkî nahêle ku em di vê nivîsê de jî du gotinên koçerkî bişkênin! Lê mala Şengul Ogur ava be ku me tê de piçekî birînên xwe bi hev re kewandin! Jixwe wekî helbestvanê frensî gotî, divê em birîna xwe nîşanî hev bikin, nexwe nakewe ezbenî.) Yaw ma hindik e ev tiştên ku ez dibêjim. Heta me tê de fesadiya Ehmed Huseynî jî kir, ma hûn êdî çi dixwazin. (Min behsa 'fesadiyê' kir, sedîsed wê niha bi mîlyonan kurd xwe noqî Facebookê bikin û wê hemû xanî û malikan bi serê hev de hilweşînin. Ya starrrr, bê lome!)

Hindik mabû ku Şivan Perwer jî bihata û tê de konserek zindî bida, lê ez niha jê derketim. Hûn jî dizanin: Nexwe ez mecbûr bûm ku min mesajên Şivan ên siyasî li vir binivîsanda! Hingê hemû rûpelên rojnamê jî têrê nedikirin heyran.

# XAÇEPIRS

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 3 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | | | ■ | | | | |
| 6 | ■ | | | ■ | | | ■ | | |
| 7 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 8 | | | ■ | | | | | | |
| 9 | | | | ■ | | | ■ | | |

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Meta, serwet... Hezkiriya Derwêşê Evdî **2.** Nêrîn... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **3.** Bi rûsî erê... Ji bo firehî, dirêjî û kûrahiya tiştekî **4.** Cephe, bere... Kar û xebat **5.** Jêderka avê... Kesê ku nezewiciye **6.** Nexweşiyek... Alif, xwarina sewalan... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye? **7.** Paytexta Perûyê... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû **8.** Rojek... Ji bo eserên ku ji serdema pêşîn maye an jî tiştê ku nirxeke wê ya dîrokî heye **9.** 12 meh an jî 365 roj... Kurteya ajansa fermî a Tirkiyeyê... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Beraza mê... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin **2.** Cure, celeb... Paytexta Yewnanistanê **3.** Xanedana qraliyeta Vîetnamê... Sureyek Quranê **4.** Aşît, şepe, berfende... Tîpên navîn ê "saet"ê **5.** Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye... Peyva neyînî **6.** Niyaza xêr û qenciyê... Elementên ne metal,mîna klor, fosfor û oksîjenê **7.** Firaqa ji gil... Notayek **8.** Notayek... Beranê 1-2 salî... Pirsek di rewşa tewandî de **9.** Ji vir û şûnde, ji niha pê de... (Ebdulsamet ...) Li gorî lêkolînan kesê ku teksta herî pêşî a kurdî di salên 970'yî de nivîsî ye.

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | J | O | ■ | A | D | ■ | D | A |
| 2 | M | Î | ■ | A | B | A | J | Û | R |
| 3 | E | N | A | M | ■ | D | E | ■ | D |
| 4 | D | ■ | F | Î | Q | ■ | N | O | ■ |
| 5 | ■ | T | E | R | E | N | G | ■ | A |
| 6 | D | Î | R | ■ | R | A | ■ | T | E |
| 7 | Û | ■ | Î | S | A | ■ | I | R | ■ |
| 8 | M | E | D | ■ | Ş | O | R | ■ | K |
| 9 | A | Y | E | T | ■ | X | A | N | Î |



Rizoyê Xerzî
rizoxerzi@gmail.com

## Şanoya dawî ya AKP'ê

Şano û rêzefilmên AKP'ê yên xapandina kurdan ji destpêka damezrandina wê partiyê û heta roja îro bi gelek rengên cuda xwe daye der. Ji destpêkê de xwe bi kum û kolozên olê girêdabûn û bi wî rengî bi salan kurd xapandin. Lê di vê dema dawî de piştî ku ew siyaset êdî nema gelekî bikêr tê û bê bandor bû, vê yekê xwe baş di hilbijartinên 29 adara 2009 an de eşkere bû. Dema ku AKP'ê dît êdî kurd bi riya olê an jî bi riya belavkirina pere û firaxên malê û her wekî din nema tên xapandin û dengê xwe li bajarên kurdan winda dike dest bi rêbazeke nû kir. Rêbaza nû jî şanoyeke nû bi navê demokrasî û wekheviyê daye destpêkirin. Bi vî rengî dixwaze ku pêşî li windakirina dengên xwe yên hilbijêrên kurd bigire. Lê navê şanoyê çi dibe bila bibe hişmedî û nêzîkaya wan a ji bo kurdan nayê guhertin.

Çawa ku cîgirê serokê CHP'ê xwest ku xwe welatparêzek baş nişan bide û bê hemdî xwe hişmendiya partiya xwe derbarê kurdan de aşkere kir, dema ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd mînaka qetîaman destnîşan kir, her wiha AKP'ê jî gelek caran niyeta xwe ya ji bo kurdan aşkera kiriye lê ew bi zanebûn vî tiştî dike. AKP her dem dijminaya xwe li ser bingeha dubendiya di nava kurdan dike û kurdan dike 2 beş. Beşê ku vê rewşê qebûl nake û ji bo bidestxistina mafê gelê kurd bi her awayî têdikoşe, navê terorîst û cudaxwaz li wan dike û beşê din ê kurdan ew kurdên ku bi riya mal û meqaman ew xapandine û inkara nasnameya xwe dikin, ew li ba AKP'ê kurdên baş û bira ne.

Bi her halî ev şano tevî ku niha bi riya AKP'ê tê meşandin lê rêveberî û derhuneriya vê şanoyê ji alî pergalê vê tê meşandin û her partiyek ji partiyên vê pergalê tenê rola xwe dilîze. Tu cudahî di navbera hişmendiya AKP, CHP û MHP'ê de tuneye. Her yek ji wan di vê şanoyê de rola xwe dilîze. Lê armanca tevan ji vê şanoyê dawî dibe yek ew jî tesfiyekirina tevgera kurd e ku pirsa kurd gihandiye qûnaxeke wiha ku êdî divê bê çareserkirin.

Leystikvanê sereke yê vê şanoya dawî Tayip Erdogan e û wekî hemû leystikên xwe yên berê gotin û pêkanînên wî pir dûrî hevin. Wekî mînak vê dema dawî gotinek ku gelekî dubare dikir ew bû ku bila hêsrên dayikan nema biherikin, ev gotin ya dayikan kurdan e ku bi salan wiha dibêjin, lê Erdogan hem wiha dibêje ji bo dilê kurdan xweş bike hem jî dibêje dê operasyonên me berdewam bikin, ma ku operasyon berdewam bikin wê çawa hêsrên dayikan rawestin an jî Erdogan tenê behsa hêsirên dayika xwe dike ne behsa dayikên kurdan dike.

Ez bawer im ku ew mesela 2 mirovên bi gir û înad vê helwesta rayedarên tirk baş tînin ziman. Mirovek ji bo ji hevalê xwe re bîne ziman ziman ew çiqasî serhişke wiha got: "Tu zanî ji roja ku ez zewicî me û heta niha ez nêzî hevsera xwe nebûme, hevalê wî got tu derewan dikî, heke wiha be ew zarokên te çawa çêbûn, rabû li hevalê vegerand û got ha ha ji ber ku ez mirovekî gelekî bi girim heta niha min ji hevsera xwe nepirsiye ku ew zarok jî ji kê ne. Îca bi rastî jî tê wateya vê înad û inkara hikûmetê tuneye û dê bi xwe re ji bilî nexweşî û hêsirên çavan tiştekî din neyne.

Wekî parlamenterê DTP'ê Ahmet Turk jî got gelo birêz Serokwezîr kîjane, em kîjanî bawer bikin yê ku dibêje bila rondikên dayikan rawestin an jî ê ku dibêje bila operasyon berdewam bikin. Lê madem ku operasyon berdewam bikin her kes dizane ku wê ne tenê dayikên kurdan lê wê dayikên vî welatî tevî bigirîn û tevî rewşa bê çalakbûnê ya demdirêj ku ji alî tevgera kurd ve hatiye îlankirin dê rojek were û ji sînorên sebrê jî bêjin êdî bese. Wê demê jî wê dîsa hemû dayik bigrîn ne tenê dayikên me û wê çareserî li ber lingan here û israra di inkar û imhayê de wê bi xwe re gelek êş û derdên nû bîne.

www.arsivakurdi.org

# Min ji bîr meke*



Arjen Arî
arjenari99@yahoo.com

*Soxî...; azadî ku tu hatî*
*Û derkevî ser riyan, bigerî li vî welatî*
*Min jî ji bîr meke, were ser gorna min*
*Were; da em bimeşin di riyên nas de careke din*
*Bi hev re, careke din da em bibînin xelekê zincîrên şikestî*
*Û em meyzênin bi hev re li rûxîna darazên kirêt*
*Û êşên ku hatine bexşandin, û wendayên jibîrkirî!*
*Bo ku wan bibînim, azadî, te û wan tevan*
*Belkî bikarim rabim ji nava miriyan!*

..............................................

..............................................

Dema ku min xwend ev helbesta şairê Afrîkayî*, bêhemdî xwe ez vegeriyam sala 2003'yê, kêlîkên daxuyandina Herêma Kurdisatanê di nava sînorên Iraqê de!

Wan rojan bi bihîstina vê daxuyandinê re; li Başûrê Rojava, li Bakur gelek mirov çûbûn ser gorên bav û kalên xwe, mizgînî dabûn wan, û gotibûn, 'Raaabinnn...... rabiiiin ji gorên xwe! Kurdistan ava bû!

Kurdistan, axa bav û bapîran, li tevî me; pêçeka zarokên di pêçekê de û ên ku niha rabûne/radibin tena û hêdî hêdî hînî meşê dibin; bi qasî ku stargeha em ên li serê dijîn û li serê dê bimirin; bi dar û daristanên xwe, bi şkêrr û şikeft û berqefen xwe wargeh û jîngeha kêzik û kurmika ye, ya teyr û tilûra ye, bi her buhist axa xwe!

Ew war, ev diyar, ev erdnîgar bi navê Kurdistanê bi nav nebe jî, weke ku em bixwazin miriyekî şîrînî ber dilê xwe bi navlêkirinê re ji nava miriyan rakin, em navê wê didin zarokên xwe: Kurdistan!

Kurdistan... dayikek li ber Kurdistana xwe rûniştibe û bi şeheke diranhûr ketibe şehkirina porê wê; şair bi bihîstin û pêjnkirina vî navî re, di wê kêliya ku bêriya Kurdistana xwe kirî de, rista xwe lê kiriye, û spartiye newaya hozan:

Kurdistanê Kurdistan/ baxçê gulan derdê dilan!

Wekî gotina pêşiyan, 'Xweda derd dabe, derman jî daye'; li tevî em ên ku li serê dijîn, dermanê şev û rojê, dermanê stêrên li asîman...û yê vê axê ye jî azadî !

Azadî; ji ya takesî heta bi ya civakî û gelerî; li ser axa xwe, li gel heval û hogir, hezkirî û dildar; di nava xizm û yaran de xweş e!

Ev axa ra û rehên me be, em ên li ser kit kit darhenar in!

Wekî darhenarê pêdiviya me jî bi rojê heye, bi hewayê heye.

Lê heke tu darê bibirî ji axê, an jî hilbikî/rakî li tevî ra û rêhên wê?

Wê gavê weke dara hatî birîn, mirovê mirî dê çi bike ji têhna rojê, ji guvîna bayê ku dê bê?

Weke kes, carinan şûm û zirziya şa'irtiyê weke 'mozika' kerb û kînê hatibe bi dor min de û min eyan û beyan gotibe, ' weke şairekî... gelî berêzan, ez bi saya serê we bindestan, di nava we de bindest im..' jî; di wê hişmendiyê de me û dizanim ku bindestiya min jî azadiya min jî bi ya vê civakê, bi ya vî gelî ve mîna xelekê zîncireke qayim, vebestî ye!

Ji ber vê şêwe hizirîn û ferasetê ez ê di dil û di çav xwe de bi bikaranîna vî zimanî serê 'benê azadiyê' bidestxistî; dibêjim, 'azadiya min ya her kesî, ya her kesî ye azadiya min'!

Û ne ez; ne tu, ne ê din, em nikarin wisa xwelîser, derbeder û tepeser li ser vê axa ku bi me re li hêviya azadiyê dibawişkê û dipawe, bêyî wê û bêyî azadiyê bijîn!

Em bijîn/ qima xwe bi bindestiyê, bêmafiyê, bêrûmetiyê binîn û bixwazin torr torr bijîn jî; loooo heyran, ne ji mafê min û te ye ku em zarokên ku ji niha de pêçiyên xwe vedikin û dikin 'V'; ji devla hembêzên dayikan bispêrin çar dîwarê zîndanan, û dahatuyeke tar î taristan!

Ji hindê û hindeyin din, êdî wext hatiye ku deriyê her zîndanê vede/bet vekirin!

Edî wext hatiye ku kevok bi kevokî firrekê li xwe bidin û bifirin!

Êdî wext hatiye ku ji lûtkeyên çiyan qewdeberfîn û refebazîn werin ber bi war û kişwera biharîn ve...

Û... edî wext hatiye ku em bi yek dengî biqîrin û bibêjin:

*Li ser hemû rûpelên xwendî*
*Li ser hemû rûpelên spî*
*Kevir xwîn kaxez an jî arî*
*Navê te dinivîsim:*
*Azadî!***

** 'Min ji bîr meke': Don Mattera, Helestvanê Afrîkaya Başûr*
*** Paul Êluard, 'Azadî' Sacha Ilitch, Weşanên Avesta*
*Nişe: Min ev benda helbêstê ji wergera tirkî ya Ahmet Yalçinkaya wergerand kurdî*



# Dara sêvê

HASÎP YANLIÇ

- Cîîîîk cîîîk cîkkkkk...
- Hahoooo!!
- Cîrano!!
- Hevalno !
- Keçê çer bû, çi qewimî, agir bi daristanê ket?
- Li pey min e, dixwaze min bikuje.
- Kî ha?
- Ma ew ê kî be! Xwedê nehiştiyê nêçîrvanek. Ew ê kî be, ew dijminên qewmê me ne.
- Qal bike, li ku wisa bû?
- Law ew mêrga darên wê hatibûn şewitandin. Te pê derxist?
- Ew mirovên hatibûn geştê, kibab çêkirin û xwarin. Agirê xwe netefandibûn, agir bi mêrga golê ketibû sala derbas bûbû. Çawa naye bîra te?
- Hat bîra min. Kibab li wan jar û ziqûm be, ji zikê wan dernekeve. Ma qey ez ji bîr dikim?
- Çima te îro ewqas kir cîkînî, wê bêje.
- Wî Xwedê nehiştiyo, tiving bera min da. Keçê wî yê min bikuşta. Hîna zarokên min biçûk in, ew ê sêwî bimînîn. Ez di mereqa wan de me. Ne di hezkirina canê xwe de me.
- Ma tu bi tenê bûyî?
- Na na. Min û Dara Gûzê ji xwe re qala bûyera çendê berê dikir. Ji nişkê ve vizîniya gulê di ber guhê min re derbas bû. Xwedê nehiştiyo, dikira zarokên min sêwî bihişta.
- Min fêm nekir û nizanim çi neyartiya me û wan neçîrvanan heye. Tu dibêjî belkî em ketine rezê bavê wan. Mîna me bavê wan kuştibe.
- Em nizanin em çi bikin, ji ber wan nêçîrvanan bi ku de herin. Canê xwe ji wan xilas bikin. Nizanim, of of of offf...
- Em ê çawa xelas bibin, hevala dara maziyê tu jî tiştekî bêje.
- Hevala Kewa Gozel, ma ka dermanê min heba min e li serê xwe bida. Ma qey te nebihîst?
- Çi?
- Mehek berê yek bi bivir bi min ket. Dikira min bikuşta.
- Kengê? Min nebihîstibû, hûn ji xwe ji min re qala tu tiştî nakin. Tu tiştên xwe ji min vedişêrî. Careke din jî tu tiştên bi serê te tên nebêjî, ez ê bixeyidim wele. Dawiyê lomeyan ji min nekî.
- Li daristanê her kesî bihîstibû, te çawa nebihîst?
- Ez pir narim şevbêrkan û cem hevalan. Tu jî zanî zarokên min hîna biçûk in.
- Êêêê, de bê ji lê çi bû ha.
- Bise ji te re bêjim, ji serî de qal bikim. Tu dizanî mirov ji bo ardûyê xwe bidin ser hev tên daristanê, karekî pîroz jî dikin bav û kalên me yên mirî dibin û di cihê wan de darên ciwan diçînin. Em bi wê pir kêfxweş dibin û spasiyên xwe bi fêkiyên xwe nîşanî mirovan didin.
- Êêê...
- Roja bûyerê serê sibê bi hênkayiyê em rabûn. Me berê xwe da rojê û me xwe vediçirand, me ji cîranan re digot beyanî baş, ji bo rojeke nû me hev pîroz dikir. Ji bo fêkiyên xwe jî me ji hev re xêrhatin digotin. Dara sêvê îsal cara yekemîn bû ku sêv anîbû cîhanê. Wisa xweşik xuya dikirin sêvên wê, me tiştekî wisa xweşik û sor li wê daristanê nedîtibû.
- Êêê?
- Êya wê, roja me xweş dest pê kir. Heta ku dengekî ji dûr dihat, qurpînî pê ket. Me got pîrekî me yê din jî wa ye çû ser miradê xwe. Me di nav xwe de şîrove dikir. Berêvarkî hew me lê mêze kir ku gundiyek kerê xwe bi dara behîvê ve girêda û bivirê xwe yê neyarê qewmê me derxist, dest bi kûştina hevala min dara sêvê kir. Min gotibû ne wisa? Dara sêvê îsal fêkî pê girtibû. Hîna pir ciwan bû.
- Êêê?
- Êya wê bi xuşîniyekê dara sêvê anî xwarê, Xwedê jê re nehişto, bi bivirê xwe yê tûj, pê û baskê hevala me li ber çavên me qutqutî kir. Pelên me dilerizîn, diranên me li hev diketin. Darên ciwan ji tirsa digiriyan û tiştek jî ji destê me nedihat. Me û hevalan li hev dinêrî. Em çerbikin, çawa ji destê wî Xwedê nehiştiyo xelas bibin, difikirîn. Hîna ev tişt di hişê me diçû û dihat, hew me lê mêze kir ku Xwedê nehiştiyo bivirê xwe tûj kiriye û bivir li noqa min dixe. Sê derbên mirinê li min xist. Haho û qîrîna min digihîşt erd û ezmanan .Qey Xxwedê dengê min bihîstibû, hema min mêze kir ji nav daran çar heb xêrxwazên daristanê, hogirên daran, hevalên me, Robîn Hoodê bêkesan, şervanên azadiyê, gerîlayên birûmet li wê derê derketin holê. Tivingên xwe ber bi Xwedênehiştiyo ve birin û gotin, 'zû bivir baveji êrdê'. Xwedênehiştiyo bi ya wan kir. Bi dengekî feqîroşkî got, 'ez jî wekî we xêrxwazê partiyê me, ma hûn çi dixazin ji min? Serfermandara wan, keçikeke delal bû, xweşik bû, ciwan bû. Ji Xxwedênehiştiyo re got:
- Tu xêrxwazê partiyê yî, tu çima biryara partiyê bi cî naynî?
- Kengê ji min nan xwestibin, min nanê mala xwe giştik daye hevalan?
- Xêrxwazê partiyê yî, çawa bi felsefa partiyê nizanî?

Me hemûya digot, bila wî neyarê qewmê me bikujin, bila aveke hênik li nava dilê me bikin.
- Êêe, de bêje ha, çer bû?
- Çer bû? Nekuştin. Serfermandara gerîlayan ew da rûniştandin û jê re got, 'Tiştek bi serê min de hatibû, ez dixwazim bi we re parve bikim. Ez hîna nû bûbûm gerîla, zivistana min a yekemîn bû di nava gerîlayan de û li çiyayên Serhedê bûm. Hûn dizanin zivistana Serhedê jî çawa ye. -Gerilayan û Xwedênehiştiyo pev re gotin erê em dizanin. Pir sar e, pir dijwar derbas dibe, gotin. Serfermandar berdewam kir; De hûn bifikirin, hûn ê rewşa min fêm bikin. Berf li êrdê ye, bayê kur tê, em sê heval winda bûn li nav daristanê. Me ji xwe re starek nedît, diqefilîn, me agir ji xwe re pêxist. Çend dar jê kirin agirê xwe gur kir ji bo ku em neqefilin.

Serfermandarê ji Xwedênehiştiyo pirsî, got; ka tiştekî bibe sûc di wê bûyerê de heye?Xwedênehiştiyo got, na wele tu tiştekî nelirê nîn e. Serfermandarê dîsa berdewam kir, got; roj ronî bû, me û hevalên din hev dîtin. Xwedê rehma xwe lê bike, me bûyer ji Serfermanderê xwe re got. Serfermandarê me got; hûn bêceza namînin. Em ecêbmayî man, me got çima? Wî jî got felsefa partiyê wiha dibêje ku parastina xwezayê parastina jiyanê ye, parastina daristanê parastina gel e. Ji bo wî jî hûn bêceza namînin. We zirar daye xwezayê, we zirar daye sewalan, we zirar daye daristanê we zirar daye gel.

Zêde dirêj nekim, ceza dan min û hevalên me jî cezayê giran dan me. Cezayê partiyê da, me bi xemgîniyekê anî cî. Niha hewce ye ku em cezayekî bidin te jî. Em ê te darizînin, xwe biparêze.

Xwedênehiştiyo xwe parast, hema neketibû serê şervanên azadiyê. Şervanên azadiyê biryara xwe aşkera kirin. Gotin; rabe ser lingan, sûcê te kiriye sûcekî giran e, ji bo ku tu dibêjî min nebihîstiye, min bi nezanî wê wehşetê kiriye, me ev biryar girt, tê bîst darên sêvan biçînî, heta ku dar sêvan bigire jî parastina wan li te ye. Xwedênehiştiyo jî got, bila ser seran ser çavan.

Şervanên azadiyê ji Xwedênehiştiyo re got; Tu biryara partiyê li erdê nehêlî.

Gundî du rojên dinê bîst darên sêvan anîn û çandin. Ew darên sêvan her çiqas şûna hevala me negire jî em bûn hevalên hev, bi xêra hevalên gerîla ji bivirê gundiyan xilas bûn.

ROJEV
20 Mijdar 2009 Hejmar: 8 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Li Amedê hesp daketin hîpodromê

Beza Kupayê ya Şaredariya Mezin a Amedê li Hîpodroma Amedê pêk hat. Hespa Balak Baba di pêşbirkê de bû yekemîn û ji xwediyê xwe re xelat anî. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Bademîr xelata xwediyê hespê bi destê xwe da.

Beza Kupayê ya Şaredariya Mezin a Amedê ku ji aliyê Kuluba Jokey a Tirkiyeyê (TJK) ve tê organîzekirin li Hîpodroma Amedê pêk hat. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr, Şaredarê Çinarê, Ahmet Cengîz, Şaredarê Surê Abdullah Demîrbaş, Midûrê Giştî yê DÎSKÎ'yê Yaşar Sari, serokên daîreyên Şaredariya Mezin û endamên Lijneya Rêveberiya TJK'ê Sadrettîn Atig di pêşbirkê de ji bo temaşekirinê cihê xwe girtin.

Hespa Balak Baba di pêşbirkê de bû yekemîn û hespa Santa Lucîa jî bû duyemîn. Di dawiya pêşbirkê de li Trîbuna Şerefê merasîmek pêk hat. Şaredar Osman Baydemîr kupaya xwediyê hespa yekemîn Îsmaîl Akbali bi destê xwe teslîm kir. Baydemîr, jokey Ufuk Akay ku di pêşbirkê de bû yekemîn pîroz kir û wiha got: "Serkeftin û qezenckirin hestên gelek xweş in. Bila serkeftina we daîm be." Baydemîr piştî axaftinê xelata jokey Ufuk Akay jî dayê.

**'Jiyan bixwe bez e'**

Baydemîr di merasîmê de bal kişand ser pêşbirkên wisa û wiha pê de çû: "Bezên hespan li erdnîgariyê aktîvîteyeke civakî û çandî ye. Ev aktîvîteyên heta niha pêk hatine, tên meşandin û ev coşeke mezin dide me. Em niha coş û heyecana wê dijîn. Hîpodoroma herî mezin li Amedê hatiye sezkirin. Ev jî dê bandorê li aboriya bajar bike. Jiyan bixwe bez e. Li gorî min pêvajoya demokrasiyê, bez e." AMED







# Jinên Karker: Hikûmet cihêkariya mezin dike

**Jinên ciwan ku temenên wan di navbera 15 û 22'an de diguhere, di sermayê de ji serê sibê heta êvarê ji bo 15 TL'yî dixebitin. Jinan nerazîbûnên xwe anîn ziman û gotin ku dewlet di nava herêman de cihêkariyeke mezin dike**

Li navçeya Bismila Amedê jinên ku temenên wan di navbera 15 û 22'an de diguhere ligel şert û mercên hewayê mecbûr dimînin ku bixebitin. Jinên ciwan ku kesên di temenê wan de niha diçin dibistanê, ew li ser erdan pembo berhev dikin. Jinên karker der barê rewşê de axivîn û gotin ew betal in û êdî li ser erdên pembo jî kar bi destê wan nakeve û wiha gotin: "Berê kar hebû. Em dihatin me pembo berhev dikin. Li gorî salên borî dîtina kar zehmet e. Şert û merc giran bûne. Hikûmet di navbera herêman de cudakariyê dike."

Li Bismilê jinên ciwan ji bo ku piştgiriya malabatên xwe bikin di sermayê de ji serê sibê heta êvarê pembo berhev dikin. Di saetên serê sibê de dest bi berhevkirinê dikin û heta êvarê dixebitin. Kîloya pembo bi 15 qurûşî berhev dikin. Ji van jinên ciwan hinekan ji ber sedemên aborî qet dibistan nexwendiye û hinekan jî bi zehmetî dibistana seratayî û lîse xwendiye. Jinan nerazîbûnên xwe anîn ziman û destnîşan kirin ku havînê diçin herêma Deryayareş û li wir findiqan berhev dikin. Jinan got li wir jî rastî muameleyên derveyî mirohiyê tên. Jinan daxwaz kir ku dewlet ji bo wan qadên kar veke.

Li Bismilê çandiniya pembo çavkaniya herî girîng a debarê ye. Ji ber ku di salên dawî de cotkariyê zirar dît pembo eleqeyeke mezin dît. Salên borî li navçeyê 200 donim erd ji bo pembo dihate veqetandin. Lê îsal ev hejmar heta 60 donimî ket. Jina bi navê Pinar Aslan anî ziman ku berê 3-4 mehan pembo berhev dikirin û kar jî zêde bû. Aslan wiha pê de çû: "Em kîloya pembo bi 15 qurûşî berhev dikin. Yanî rojê 15-20 TL'yî em qezenc dikin. Berê em zêde dixebitîn. Berê kar zêde bû. Niha pembo bi makîneyan tê berhevkirin. Daxwazeke me ji dewletê heye. Bila ji bo herêma me razemeniyê bike."

**'Razemenî tune ye'**

Jina bi navê Arîfe Taş ku lîse xwendiye, bal kişand ser polîtîkayên dewletê û bi lêv kir ku dewlet di nava herêman de cudakariyê dike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ez ji bilî vê karekî din ji bo xwe nabînim. Ji ber vê ez têm pembo berhev dikim. Salê em 3 mehan dixebitin. Divê dewlet bi awayekî wekhev nêz bibe."

Jina bi navê Sabahat Taşkin jî bertekên xwe anîn ziman û wiha got: "Ji ber ku kar tune ye em mecbûr in vî karî dikin. Havînê jî em diçin bajarên rojava. Berê em 4-5 mehan dixebitîn. Lê êdî ev jî tune ye. Em salê 10 mehan li malên xwe rûdinin. Tenê du mehan em dixebitin." AMED

### 'Ez ji mecbûrî dixebitim'

**ROJDA** Bulut (15) jî der barê rewşa xwe de axivî û wiha domand: "Ez qet neçûme dibistanê. Ji ber sedemên aborî ez mecbûr im bixebitim. Havînê jî em diçin bajarên rojava. Em li wir bi muameleyên derveyî mirovahiyê re rû bi rû dimînin. Ez mecbûrim bixebitim. Lê ez karekî w isa naxwazim." Cotkarê bi navê Engîn Ayaz jî wiha got: "Pembo êdî pere nake. Em van erdan bi îcare digirin. Gelek mesref lê diçe. Mînak gubre, mazot gelek buha ye. Buhayê pembo mesrefan dernaxîne. Em jî qezenc nakin. Xwezî pembo baş bihata firotin û hem me û hem jî karkerên me rehet bikira. Daxwaza me ev e ku her kesî heqdestê xwe bigirta. Lê mixabin rewş wisa ye."

## Almanya: Tirk pir pere xerc dikin

Enstîtuya Lêkolîna Rayagiştî Info Gmgh lêkolînek kir û di encama lêkolînê de derket holê ku tirkên li Almanyayê di demên xwe yên vala de pir pere xerc dikin.

Her wiha di lêkolînê de hate destnîşankirin ku alman ji sedî 24 zêdetir danûstandinê dikin û di lêkolînê de wiha tê gotin: "Tirkên ku li Almanyayê dijîn ji sedî 60 pereyên xwe li maxaza û marketan xerc dikin." Li gorî rojnameya Handelsblatt ku encama lêkolînê weşand, wiha vedibêje: "Tirkên ku li Almanyayê dijîn aboriyê zindî dikin. Bi vî awayî tirk nikarin pere jî berhev bikin." Di encama anketan de derket holê ku tirk li gorî almanan pere kêm berhev dikin. BERLÎN

## Li Ukraynayê nexweşiya AIDS'ê zêde dibe

Li Ewropayê AIDS herî zêde li Ukraynayê heye. Li bajarê ukraynî Odesayê ji her 15 kesî yek bi nexweşiya AIDS'ê dikeve. Di nava welatên ewropî de AIDS herî zêde li Ukraynayê tê dîtin. Mirina ji vê nexweşiyê jî herî zêde li vî welatî pêk tê. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin li bajarê kersaxa derya reş Odesayê ji her 15 kesan yek HIV pozîtîf e. Nexweşî di nava zarokan de gelek belav bûye û gelekên wan jî nayên dermankirin û li benda mirina xwe ne. KÎEV

# Şaredar Turk çû serdana romenan

Şaredarê Akdenîza Mersînê M. Fazil Turk, Komeleya Piştgiriya Çand û Civakî ya Romenan ziyaret kir. Şaredar Turk destnîşan kir ku gelê romen jî wekî gelê kurd hatiye asîmîlekirin û wiha got: "Em wekî şaredariya Akdenîzê, ji bo ku gelê romen çanda xwe biafirîne çi pêwîst be em ê bikin."

Şaredarê Akdenîzê M. Fazil Turk çû serdana Komeleya Romenan. Romen li ber avahiya komeleyê hatin cem hev. Romenan Şaredar Turk bi kulîlk, def û zirneyê pêşwazî kir.

Piştî peşwazikirinê Şaredarê Akdenîzê Turk, Serokê Goç-Derê Selahattin Gonenç û Serokê Komeleya Piştgiriya Çand û Civakî ya Romenan Cemal Mogultekîn li hundirê komeleya romenan geriyan. Serokê Komelaya Çand û Civakî ya Romanan Cemal Mogultekîn ani ziman ku heta niha tenê DTP û şaredaren DTP'î komeleya wan ziyaret kirine. Mogultekîn da zanîn ku ji bo serdana wan gelek kefxweş bune. Mogultekîn wiha dirêjî da axaftina xwe: "Hata niha saziyên civakî û komeleyan qet nehatine serdane me. Tenê Şaredarê DTP'ê hatiye serdana me. Ji bo serdana Turk em hemû kefxweşin. Gele romen jî hatine asîmîle kirin. Me ji bo xwe komele vekir. Ji bo vekirina komeleyê me serî li gelek saziyan da. Lê tu kes bi me re eleqeder nebû. Tenê Şaredarê Akdenîzê Fazil Turk alîkariya me kir. Em ji şaredar Turk razî ne. Me kengî li deriyê wî xist alîkarî da me. Îro jî hate serdana me. Ev ji bo me kêfxweşiya herî mezine."

Serokê Komeleyê Mogultekîn di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Piştgiriya me dê ji bo Turk her tim hebe. Komeleya me di salan 2004'an de hate avakirin. Komeleya me li gel zehmetiyan heta îro hatiye. Armanca me eve ku civaka romen di nava şert û mercên baş de bijî. Li Tirkiyeyê romen di rewşeke xirab de ne. Em dixwazin ku ji bo vê hewldanek hebe. Lê mixabin dê tu hewldanên dewleta tirk tunebe. Daxwaza me tenê xanî û kar e. Pêwistiya me bi cih û war heye. Baweriya me tenê bi şaredarê me heye."

Şaredar Fazil Turk axaftinek kir û wiha got: "Mixabin em niha nekarin ji bo şaredariyê karkeran bigirin. Lê ji bo ku ev gel nan bibe mala xwe hewldanê me hene. Ji bo vê çi pêwist be emê bikin. Ji bo me însan însane. Cudabûnên me dewlemendiya me ye. Divê em vê dewlemendiya xwe hembêz bikin. Bila birayên me yên romen projeyên xwe pêşkêşî me bikin. Em kurd ji derdê bindestan fêm dikin. Emê desturê nedin romen suîstîml bibin. Emê projeyên we bi nirxînin." MERSÎN



www.kurdipedia.org